


*Kendalê Nezan
ji halê Kurdan
ci zane?*

Rûpel 7




Ewrûpa bi pas ve diçe

Almanyayê jî li dû Fransayê cerd birin ser sazî û komeleyên alîgir û dilxwazên PKK'ê, bi hinceta ku qanûnê cezayî yêne komaleyen daye bin piyan û pergala giştî ya wan xistiye talûkeyê. Ev kirinêwan wek derbeya li dijî demokrasiyê hate nîrxandin.

Ev bîryara siyasi ya Fransa û Almanyayê ya li dijî gelê Kurd bi xwe re hin gengeşîyan jî anî rojeva Tirkîyeyê. Di binê gavavêtinêwan de li sebeban tê gerîn, gûman têne kirin û wek serkevtina dîplomatîk a Tirkîyeyê jî nayê nîrxandin.

Rûpel 8

Nicolas VIAL



Li Parîsê meşa mezin

Parîs, Welat- Li paytexta Fransayê, Parîsê zêdeyi 10 hezar Kurd, Tirk, Ereb û Fransiz, ji bo vekirina komaleyên Kurdan ên ku ji aliyê dewleta Fransayê ve hatibûne girtin û berdâna 20 kesên girtî meseke mezin li dar xistin.

Meş di 2'yê Kanûnê de li Parîsê ji Meydana Republique'yê dest pê kir û li Meydana Bastille'yê dawî le hat. Nêziki 30 rîexistinêne Kurda, Fransiz û Tirk besdarî mesê bûn. Di mesê de besdarîn Fransiz nîvîsên "Em jî PKK ne" bi pista xwe ve danibûn û sloganêni bi Fransizî yêne wek "Ji bo Kurdistanê pistigirî" diavêtin. Di nav mesvanêne Kurda de gelek ji jin û zarok hebûn û li pista hemûyan nîvîsên "Em jî PKK ne, me ji bigirîn" hebûn. Rîexistinêne Fransiz ên ku besdarî mesê bûbûn, li refa pêşin a kortejê dimesiyen û Wezirê Karê Hundîrin ê Fransayê vewwendiyê istifakirinê dikirin û pêkutiyêne dewleta Fransiz ên li ser Kurdan protesto dikirin.

Weke tê zanîn hikûmeta Fransiz bi bîryareke bil ez komaleyên Kurd girtibûn û li dijî Kurdan operasyoneke dorfireh pêk anîbûn. Ev mesa mezin a dawî ji nîsan dide ku dosten Kurda li tu derê wan bi tenê nahêlin û deng didine livbaziyan wan ên mafdar.



Xebatek li ser şanoya Kurdi

**DESTPÊKA
ŞANOYA
KURDÎ DRAM E**

Rûpel 16



Di 7 saliya damezirîna YJWK'ê de

**'JINA KURD
HILBERÎNA
RÊXISTINIYÊ
DISTÎNE'**

Rûpel 12

Em bala xwe bidin zimên

Ji bo Welateke hîn geşîr û naverok dewlemend ez dixwazim çend nêrinê xwe pêşkeşî we bikim. gelek spas û bimînin di xweşiyê de.

Qedexebûna li ser zimanê me heta îro wêje. helbest, çand û berhemên me yêne peyvînî dane windakirin. Demma ku Welat dest bi weşanê kir. ji keyfan min nizan bû ce-wa bikim. Lew xebat û lêkolînen min û yêne weke min temirandî diman. Me ew bi gelê xwe ne didane xuyanîkirin. Lî edî Welat bû dev. çav û gavê me. Welat ji bo xebat û lêkolînan bêhtir em tûj kirin.

Niha divê çend nêrinê xwe diyarî we bikim.

Berî her tiştî gereke rola Welat, ne rola rojnameyeke weke rojane tenê be. Divê ku peywira kovareke çandi ji deyne ser milên xwe. Ji ber vê yekê di naverokê de divê çi hebe?

1- Ji nû ve dest bi perwerde û hînbûna xwendin û nivîsandina Kurdi bikin. Berî dest-pêk ji bo hezkirina xwendevanen nû di rojnameya Gündemê de haydêniyan (ilan) bîdin weşandin. Da xwendevan karibin taqîb bikin.

2- Ji bo teşwîq û pêşvekiri-na ziman. cih bidin helbestvan

û helbesten wan.

3- Rûpelekji bo wênezan û karîkaturvanan vejetînin.

4- Ji bo nameyên xwendevanen rûpelek hindik e. Du rûpel bin çêtir e. Gelek xwendevan bi weşana nameyan li zimên xwedî derdikevin. zimên bi pêş ve dibin. Ew name ji bo gelê me dibine meydana got û bêjan, têkiliyê û hev û din naskirinê.

5- Rûpelekji bo berhemên wêjeyî, roman, çîrok û helbestan vejetînin. Da xwendevan wan berheman nas bikin û bixwînin. di vê rûpelê de bidor wan tefrîqe bikin. Ez mînakekê bînim, romaneke Ereb Şemo tefrîqe bikin. Ku ew dawî bu dest bi romaneke Mehmet Uzun bikin û an jî helbesten Cegerxwîn û hwd.

6- Di rûpela sporê de lîstikên Kurdan biweşînin. Ji xwendevanane danehev û berheva lîstikan bixwazin.

7- Beşçeyê zarokan ji bi kîmasî tê pêkanîn. Gereke hûn cih bidine name, nivîs, wêne û pêkeniyê zarokan ji.

Niviskarên Kurd bi girin-giyê li ser nivîsen xwe ranawestin. Peyv çawa tê ber devê wan wiha dinivîsin. Min di rojname û kovaran de gelek nivîsen wiha didîtin. lê

min digot belkî ji xetaya çapê an jî xetaya tiprêzkirinê ye. Ji ber vê yekê min ew nivîs rexne ne dikirin.

Di hejmara welat a 92'yan de navê pirtûka Gabar Ciyan "Eşa Zirav?" bala min kişand. Vî navî ez mecbûri rexneyê kirim. Li gorî min ev nav heke ku di wateya êşê de hatibû bi nav kirin "zirav" çewt hatiye nivîsandin. Ku ev ne navê pirtûkê bûya, belkî ewqasî li ser ranawestiyama. Lî tiştîki welê li ber çav, pêdiviyê tîne ku mirov li ser raweste.

Di Kurdi de peyvîn geleki nêzîkî hev hene, ku dengê wan yek be lê wateya wan pirr ji hev cuda ne. Navê pirtûka "Eşa Zirav" ji ez wiha dibînim. "Zirav" û "zirev" nêzîk in lê wateya wan cuda ye. "Zirav" kîsikek ava tal a bi keze-ba (cegera) mirovan û heywanan ve ye. Ji kesen tirsonek re em dibêjin "bêzirav, ziravê wî tune", an jî ku hinek ji tırsa dibêhitin, em dibêjin, "ziravê wî qetîyan." Lî "zirev" tê wateya tiştî ne stûn (qalind) ji ber ku êşa zirav mirov ji hal dixe û geleki zeif dike navê wê nexweşiyê bûye êşa zirev. li gor nêrîna min divê navê pirtûkê "Eşa Zirev" be.

Nûşer Dilan

Roja 27'ê Mijdarê

Xebatkarên rojnameya Welat ên heja, niha dilê me bi dîtina 27'ê Mijdareke nû. geş û bi coş e.

Di rojekê wiha ku, dilxwaziya gelê me ya hezar salan ku bi rîberiya partiyê pêk tê, meclîs û gelek saziyên ku nişana dewletbûyînê ne, derdikevin holê û bi xwîna şe-

hîdîn timzindî, rehêne xwe berdidin nava xaka welêt, em vê rojê pîroz dîkin. Agirê serxwebûn û azadiyê ku bi destê gelê me û kurêne wan yêne leheng di her 27'ê Mijdarê de hîn bilindtir dibe, wê 16 saliya partiya me ya ku xwe bi bîrdoza sosyalîzmê şî-dandiye, bigîhîje radeya ser-

kevtinê. Em bi vê dilxwesi û baweriyê vê roja mezin li gelê xwe û hemû mirovantiya pêşverû pîroz dîkin û bi rîzda-riyeke ji dil silavan radîgîhînin.

Li ser navê girtiyen ji doza PKK'ê

Mehmet Sinci / Yozgat

Nirxên gel biparêzin

Ji xebatkarên Welat yn hêja re: pêşî ez di karê we û jiyanâ we de serkevînê daxwaz di-kim. Ji ber ku di gel hemû di-jwariyan hûn vê rojnameyê

pêşkêsi me xwendevanen dîkin. ez spasdarê we me. De-ma ez Welat dixwînim, ez şanaz dibim.

Tiştî herî nebaş ev e ku

gelek li ziman û çanda xwe xwedî dernekeve, nebe xwe-diyê wan nirxên xwe û ku dî-roka wî bi destê biyaniyan bê nivîsandin.

Jiyana gelekî, bi parastina nirxên wî çêdibe. ji lew re her rîza ku di Welat de hatiye nivîsandin ji bo rûmetekî wê heye. Em di wê baweriyê de ne ku Welat bi hêsanî derna-keve. tiştî ku di nav dijwariyan de bê afirandin. hîn bi rû-met e û bî hêsanî ji dest naçe. Ez bawer dikim ku hûn bi e-vîndarî radîhêjin pênuşa xwe Welat diafirînin, ez di vî karî pîroz de serkevîna we dixwazim.

**İskan Açıqça
Girtîgeha Aydinê**

Salvegera 15. pîroz be

Hevalino!

27'ê Mijdarê roja ji xewa giran şiyarbûnê ye.

Em salvegera serkevînê ya 15'mîn ya têkoşîna serxwebûn û azadiyê pîroz dîkin.

Di gel daxwaza serkevînê bi dil û can silavan li we dikin.

**Dilîn cengê yê şoreşger û welatparêz
yê Girtîgeha Sağmalcilarê**

Nivîsara Welat

Rewşenbir û gel

J i 22'ye Sibata 1992'yan ve Welat bi rîk û pêk, bêrawestin her hefta derdikeve. Di vê pêvajoya ku me li pey xwe hişt de, bi hezaran xwendevanen me bi nameyên xwe ji me re tînin zimên ku bi navgîna Welat fîrî nivîsandin û xwendina Kurdi bûne. Bi vê yekê em iftîxar dîkin. Welat ne tenê rojname, li her wiha dibistanek e. Yêne ku dizanîn jê istîfade bikin ew ji bo wan dibistaneke pirralî ye. Bi gotineke din ew, dibistana Kurdan a neteweyî ye. Di nav dersên vê dibistanê de, al-fabe, ziman, wêje, dirok, erdnîgarî, zanist, wêne, müzik û hwd. hene û ji sê saliyan ta 70 saliyan her kes dikare ji dersên vê dibistanê istîfade bike. Her kes li gor se wiya xwe, jê re ci la-zim e, dikare jê fîr bibe.

Divê neyê jibirkirin ku Welat xwe ji gihiştandina gelê Kurd ê bindest berpirsiyar dibîne. Îro ji 30 milyon Kurd heye, hejmara kesen ku dikarin bixwînin û binivîsin nagihîje sed hezaran. Weki din hê ji zehfî xwendevanen me dixwazin ku em bi zimanekî hêsan-tir û li ser mijarên gelêrî edî zehf binivîsin. Pirr kes ji hene tevi ku dixwazin, hîna nikarin bi Kurdi bixwînin. Ji ber vê ye ku em mecbûr in rewş û sewiya kambax a gelê Kurd ê bindest li ber çavan bigirin.

wan têr bike, di Welat de nabînin.

Dibe ku ev kes ji her aliyi ve xwedî zanîneke pirr gewre ne, ji ber vê yekê ji pêdiviyê bi xwendina Welat nabînin. Weki din em girîngiyeke mezin didin rexneyen ku lê Welat têne kirin bi wî şerti ku hevgirtî û za-nistî bin. Lî tevi vê yekê em rexneyen van kesen ku Welat hêjayê xwendinê nabînin, zêde cidî nahesibînin. Ji ber ku Welat ne tenê ji bo xwendinê, lê ji bo nivîsandin ye ji. Weki ku ev kes Welat qels dibînin û pê têr nabin, dikarin tê de binivîsin û vê carê zanîna xwe ya serdestê Welat bidin fîrkirinê.

Ew baş dizanîn ku her xwendevanekî Welat her wiha xwedî maf e ku bibe nivîskarê Welat ji.

Bes, tiştîkî din heye, divê neyê jibirkirin ku Welat xwe ji gihiştandina gelê Kurd ê bindest berpirsiyar dibîne. Îro ji 30 milyon Kurd heye, hejmara kesen ku dikarin bixwînin û binivîsin nagihîje sed hezaran. Weki din hê ji zehfî xwendevanen me dixwazin ku em bi zimanekî hêsan-tir û li ser mijarên gelêrî edî zehf binivîsin. Pirr kes ji hene tevi ku dixwazin, hîna nikarin bi Kurdi bixwînin. Ji ber vê ye ku em mecbûr in rewş û sewiya kambax a gelê Kurd ê bindest li ber çavan bigirin. Ev rewşa kambax me pirr diêşîne, lê rastiya me ji ew e. Wezifeya ku dikeve ser milê me, bêwestan û bêrawestin di demeke pirr kin de gihiştandina gelê Kurd û ji holêrakirina rewşa wî ya kambax a paşvemayî ye.

Divê bê zanîn tu gel û netewe ji xwe re, bêzehmetî û dijwarî ji nezaniyê xelas nebûne. Dema em diroka neteweyen herî pêşketî dixwînim fîr dîbin ku heta gihiştine serpîlka xwe ya hemdem têkoşînê ku hisê mi-rovan disekinînin li dar xistine û bi taybetî ji rewşenbirê wan ji gelên xwe re bûne rîber û her tim bi wan re bûne.

Lê rewşenbirê me çiqas serê xwe bi pirsgirêkîn gelê xwe re diêşînin?

.....NÜÇEYÊN CENGÊ.....

Hewlêñ dengbirrînê

Li Kurdistanê li her deverê gund têne hilweşandin û demeke dirêj e ku hêzên dewletê hilweşandina gundan ji xwe re kirine armanceke heri girîng. Dixwazin Kurdistanê bêmirov bihêlin, têkiliya gel û PKK'ê ji hev biqetinîn. Her roj bi dehan gund ji aliyê timêñ taybeti û leşkeran ve têne rûxandin. Tehde û zilma ku li ser gelê Kurd didome her diçê xurtir dibe. Li hemberî vê rewşê dewletê Ewrûpî tu havilek hilnedane, bîrrîn û bişavtina li ser gelê Kurd ji bo wan ne pirsgirêkeke lezgîn e. Li dijî têkoşîna gelê Kurd derdi Kevin û aligiriyê didine artêşa Tirk a xwînmij û mafxwar.

Navenda Nûçeyan-

24 Mijdar 1993: Hêzên dewletê li Şîrnexê. li herêma Bestanê li hemberî gerîlayêñ ARGK'ê oparaşonêñ dorfireh tînin pê. Li gorî çavkaniyêñ herêmî ta niha hêzên dewletê. li herêmî ji ber êrisen gerîlayan nikarin derkevin. Di bûyerê de 50 leşker û 5 gerîla hatine kuştin. 7 gerîla jî birîndar bûne

Opârasyonêñ dewletê li herêmîn Pasûra Amedê xurt dibin. Operasyon li gundê Nasirka, Araşka, Kanîka û Banê, ku li ser Pasûrê ne didomin. Li gorî agahiyêñ herêmî ev gund yeko yeko têne xesirandin. Hêzên dewletê êris birin ser gundê Şêxemzê. 5 kes xistin binçav.

Hêzên dewletê avêtin ser gundê Quye û zozanêñ Hamek û Hopikê ku li ser Pasûra Amedê ne. 50 mal şewitandin. Bi navê Eyup Donat kesek li ber çavê gundiyan hate kuştin. Li gundê Duderyayê 8 mal ji aliyê leşkeran ve hate hilweşandin. Kela Kafîronê, ku li herêma navçeya Pasûrê ye. ji aliyê leşkeran ve hate xesirandin. Pezê ku di Kelayê de bû, jê 10 heb telef bûn. bi navê İbrahim Gunes kesek birîndar bû. Leşkeran avêtin ser gundê Kanîka û Nederanê 9 kes xistin bin çav. Hêzên dewletê cerdî ser gundê Şîrnaz û Dimilyayê kirin jê 4 mal hilweşandin. bi navê Ziya Aslan û Velî 2 kes xistin bin çav. Ji van kesan tu agahî nîn e. Li Elihê li çar cihan bûyer qewimîn. 5 kes hatin kuştin û 2 kes jî birîndar bûn. Li Amedê ji aliyê kontrgerîlayan ve bi navê Mahmût Kavût. Aydin Tîrmak 2 kes hatin kuştin.

25 Mijdar 1993: Gerîlayêñ ARGK'ê êris birin ser navçeya Cizîrê. avahiyîn fermî û leşkeriyê dane ber roketavêj û çekêñ giran û ew xesirandin. Pişti êrisê hêzên dewletê avêtin ser navçeya Cizîrê. her der dâne ber bombeyan, gelek mal û dezgeh hilweşandin. Di bûyerê de bi navê Behîye Kizilkaya jînek inîr û 2 kes jî birîndar bûn. Li Edîn pişti gulebarankirina otobeseke leşkeriyê. polîs û tîmîn taybeti cerdî ser taxêñ Kurd ku lê dijin. kirin û 300

kes xistin bin çav. Li Dêrika Çiçayê Mazî ya Mêrdinê 14 kes, li Zanistgeha Firadê ku li Elezîze ye jî 2 keç hatin girtin.

26 Mijdar 1993: Serokê DEP'a Tûxê (Tetwan) Şevket Epözdemîr ji aliyê hêzên dewletê ve hate kuştin. Laşê Epözdemîr li nêzikahiya Tahtalikopruye ku di navbera Tûxê û Norşînê de ye hate dîtinê.

Cerdevanan avêtin ser gundê Girselaletê ku li ser Hazroya Amedê ye, 6 mal rûxandin (hilweşandin). Leşkeran avêtin ser gundê Barqûşê, malek şewitandin, televîzyonêñ wan û hacetên navmali şikandin. Hêzên dewletê avêtin ser gundê Xosxeberê ku li ser navenda İdirê ye ji malbatekê 3 kes xistin bin çav û Mehmet Er ji aliyê polisan ve bi işkence hate kuştin.

Li Aralixa İdirê 8 gund di bin ablûka leşkeran de mane. Li gorî çavkaniyêñ herêmî, dewlet amadekariya operasyon û qetbirran dike. Li herêmî rewşêke kambax didome. Leşkeran der û dorën gundê Qiracbaxê ku li ser İdirê ye girtin. Li İdir û Agiriyê 9 kes ji aliyê hêzên dewletê ve hate xesirandin. Pişti bûyerê gundê Birîka vala bû.

Leşkeran êris birin ser gundê Evcîmê, Karahaciliyê, Korûkentê, Adetî û Aşaxî Çamûriyê ku li ser İdir û Araalixê ne, li gundiyan işkence kirin û 9 kes xistin bin çav.

30 Mijdar 1993: Di navbera hêzên dewletê û gerîlayêñ ARGK'ê de li Dêrsimê li herêma Nêwala Qutê ser derket. Bûyer ta êvarê dom kir, der barê kuştî û birîndaran de tu aghâ nîn e. Li gorî agahiyêñ fermî, di bûyerê de 4 gerîla hatin kuştin.

Konvoyeke leşkeran li ser riya Cizîr û Şîrnexê kete kemîna gerîlayan, ji konvoye 2 erebe xesirîn. Hêzên dewletê li Sêrtê, li navçeya Hewêlê (Baykan) li Taxa Ormanpinarê cebirxaneyan dicivînin.

Li Sêrtê, li navçeya Misricê (Kurtalan) 500 leşkeren qereqola navçeyê tetbiqat kirin. Li gorî gelê navçeyê ev tetbiqatênu ji aliyê leşkeran ve çê dibin, armanca wê çavtîrsandin e.

Hêzên dewletê avêtin ser gundê Melazgira Mûsê, jê 20 mal şewitandin û gelek kes xistin bin çav. Bûyer li gundê Xalîtyariza qewimî.

Gerîlayêñ ARGK'ê da ser gundê Çilqazê ku li ser Elihê ye. di bûyerê de cerdevanek birîndar bû. Hêzên dewletê li Kercewsa (Gercûş) Elihê (Bartman) oparaşoneke dorfireh a-nîn pê. Li gorî çavkaniyêñ herêmî leşkeran li hemû malen gundiyan geriyane û malen wan serobinî hev kirine. Binçavî tu-ne.

28 Mijdar 1993: Li Melazgira Mûsê li gundê Kêranlixê, Nordînê, Tendürekê êrisen dewletê didomin. Leşkeran li van gundan 50 mal şewitandin û gundiyan işkence kirin. Li gundan İdirê ji terora dewletê her diçê zêde dibe, li gundê Mûşudâlî yê 6 kes ji aliyê dewletê ve hatin girtin.

Bi navê Mehmet Gökmens kesek li Elihê li Taxa Aydinliklerê ji aliyê hinek kesan ve hate kuştin.

Belavkarê rojnameya Ö. Gundemê Adnan Işik, ji aliyê hinek kesan ve li Wanê hate kuştin. Ji bo salvegera damezirîna 15. ya PKK'ê li her derê Kurdistanê meş û pozberî çebûn. Li Agirî û İdirê ji esnaf kepeng girtin. Ew operasyonê ku li zozanêñ Hosîyan û çiyyâye Katoyê ku li ser Berwariya Şîrnexê ne didomin, ji ber berfbaran sekînî. Li gorî Çavkaniyê herêmî 3 firoke ji aliyê gerîlayan ve hatine xistin. Di bûyeran de 15 leşker, 7 cerdevan û 7 gerîla, 2 serbaz hatine kuştin.

29 Mijdar 1993: Hêzên dewletê cerdî ser 2 gundê Melazgira Mûsê kirin û 17 mal hilweşandin. Gurdê Birîkê ku li ser Bismila Diyarbekirê ye ji aliyê hêzên dewletê ve hate xesirandin. Pişti bûyerê gundê Birîka vala bû.

Leşkeran êris birin ser gundê Evcîmê, Karahaciliyê, Korûkentê, Adetî û Aşaxî Çamûriyê ku li ser İdir û Araalixê ne, li gundiyan işkence kirin û 9 kes xistin bin çav.

30 Mijdar 1993: Di navbera hêzên dewletê û gerîlayêñ ARGK'ê de li Dêrsimê li herêma Nêwala Qutê ser derket. Bûyer ta êvarê dom kir, der barê kuştî û birîndaran de tu aghâ nîn e. Li gorî agahiyêñ fermî, di bûyerê de 4 gerîla hatin kuştin.

Konvoyeke leşkeran li ser riya Cizîr û Şîrnexê kete kemîna gerîlayan, ji konvoye 2 erebe xesirîn. Hêzên dewletê li Sêrtê, li navçeya Hewêlê (Baykan) li Taxa Ormanpinarê cebirxaneyan dicivînin.

Li Sêrtê, li navçeya Misricê (Kurtalan) 500 leşkeren qereqola navçeyê tetbiqat kirin. Li gorî gelê navçeyê ev tetbiqatênu ji aliyê leşkeran ve çê dibin, armanca wê çavtîrsandin e.

Hêzên dewletê avêtin ser gundê Melazgira Mûsê, jê 20 mal şewitandin û gelek kes xistin bin çav. Bûyer li gundê Xalîtyariza qewimî.

Li Mereşê, Dîlûk û Şîrnexê 68 kes ji aliyêñ dewletê ve hatine girtin. Dibistanen li gundê der û dorën navenda Sêrtê û navçeyen Sêrtê, ji aliyêñ dewletê ve têne girtin. Li gorî çavkaniyêñ herêmî 500 dibistan hatine girtin. Ew gundê ku lê cerdevan pirr in dibistanê wan vekirî dimînîn.

HAWAR

Dilbixwîn

Qedexekirina PKK'ê!

D i 26'ê Mijdarê de, rojev dîsa bû PKK. Vê carê xala yekemîn di rojev de ne revandina tûrstan û ne jî standina bîryara şerrawestinê ye. Hemû ajansên rağihandinê edî li ser vê mijarê disekinî: "PKK li Almanya qedexe bû!"

Bîryara qedexekirina xebata PKK'ê li Almanyayê Wezîrê Karê Hundîrin Manfred Manther anî zimên. Weke ku di bin giraniya kabûsekê de be, heyecanê xwe dabû ser wî, ez bawer dikim dizanibû ku standina vê bîryarê ew xiste nava kêmînekê, ji lew re jî li hemberê kamerayan dilerizî. Li aliyeqî qedexekirin û li aliyê din jî reaksiyona gelê Kurd û sloganâ "PKK Gel e, em PKK nel!", dianî pêşıya çavêñ xwe, mat û şas mabû.

Ez dixwazim gotina "qedexekirin" di nava du neynokan de binivîsinim. Ji ber ku baweriya min bi qedexekirina PKK'ê nayê. Bi daxuyaniya Wezîrê Almanyayê yê karê Hundîrin Manther re, sê pirs xwe nişan didin:

a) Nêzîkbûna Almanyayê ji PKK'ê. Pirs-girêka Kurdi û armanca standina bîryarê
b) Gengaze (mîmkûn e) PKK were qedexekirin?

c) "Qedex-

kirina" PKK'ê û reaksiyona gelê Kurd

Der barê pirsgirêka Kurdan de Almanya politikayeke durû dimeşîne. Li aliyeqî çekêñ qirkirinê difiroşe Tîrkiyeyê û li aliyê din jî humanîzma xwe ya sexte ji bo Kurdan nişan dide û dibêje, "Divê Tirk li Kurdan zilmê nekin, bila Kurd jî bi zimanê xwe bixwînin û binivîsinin... Em mafêñ Kurdan diparêzin..." Elbete ev durûtiyek e.

Yekser, bêyi gotübêj bi standina vê bîryarê re Almanya piştgirîya politikaya hikûmeta Tirk a qirkirinê ya li hemberî Kurdan dike. Li Kurdistanê kontra û sixûren dewleta Tirk we latparêzen Kurd direvîn, dikujin, winda dîkin û nahîlin ku zarok ku li şîrî diya xwe bimije, li Almanya ji polîsîn hikûmeta Almanyayê bi şev diavêjin ser malan çavêñ jînêñ Kurd girê didin û di tariya şevê de wan çavgiyêdayî, destgîrêdayî dibin qereqolê û heyâ serê sibehê bi metodêñ terorîstan wan ditirîsinin. Di navbera polîsîn Tîrkan û yêñ Almanan de tu cûdabûn hene? Li Cizîrê tanqêñ Almanan malan dirûxînîn, li Almanya ji timêñ "antîterorê" bi ser mal û komeleyen Kurdan ve digirin. Her tiştî talan dîkin.

Bi vî awayî ye demokrasiya împeryalistan. Balyozxaneyen (Konsolosxane) kuşdaran (qatilan) ên ku tenê dikanin insanan bikujin qedexe nakin, diçin komeleyen Kurdan ên çandî talan dîkin. Em tu caran dostaniya bi vî awayî nawxazin. Dostêñ dijiminan dijiminê me ne. Dostêñ ku em bi çekêñ wan werin kuştin, tu caran mafêñ me naparêzin. "Dostêñ" wiha durû divê em baş nas bikin. PKK ji çarçoveya rîexistineke siyasî û leşkerî derketiye, edî bûye gel. Ji sê gotinan PKK di van 15 salêñ derbasbûyi de bû partiya gel. Gel wê diparêze û xwendî lê derdikeve. Niha her maleke Kurdan Komeleyen PKK'ê ye. Di her maleke Kurdan de alêñ PKK, ERNK, ARGK'ê, posteren Serok û wêneyen gerîlayan û şehîdan têne dîtin. Pênc kes dema ku li malekê digîhin hev, li ser tevgera rîzgariyê diaxivin. Her Kurdeki welatparêz bûye PKK. Ev çawa dikare were qedexekirin?! Polisîn Almanan dikarin weerin ji komeleyan alêñ rengin, pirtûkan û plakatan bidizin, lê hemâ nikarin PKK'ê ji dilê Kurdan derxînîn. Çiler jî bila vê yekê bizanibe. Me sersala Partiya xwe li her cihî pîroz kir, di 27'ê Mijdarê de me dîsa alêñ xwe di komeleyen xwe de bilind kirin. Roja sersala partiyê ev deng ji komeleyan dihat: "PKK em in, em PKK ne! Hün komeleyan bigirin jî malen me vekirîne. Hün me sirgün bikin jî, ji PKK'ê re dilê me vekirîne. Nêzîki PKK'ê nebin, weerin me bikujin!.."

Îsraîl: Kurd ne dijminê me ne

Nûçeyen Derve- Kovara EL WESET (bi Erebî - 22/11) di nîseke xwe de li ser têkiliyên Tirkîye û Îsraîl rawestîya û wiha nîvîsi: "Îsraîl razî nebû ku ji bo xatirê Tirkîye xwe bixe nava şerê hikûmeta Tirkîye û PKK'ê. Dema ku Wezîrê Karêne Derve yê Tirkîye Hîkmet Çetin di meha Mijdara bûrû de seredanî Îsraîlê kir, berpirsiyaran şâşbûna xwe a-nîn ziman ku çawa berpirsiyaran Îsraîl Tirkîye û rojnameyên Tirkîye bibejin: "Îsraîl di şerê me yî li dijî PKK'ê de alîkarî bi me re dike." Her wiha berpirsiyaran Îsraîl gotin: "Îsraîl amade ye ku di gelek âliyan de hevkariya Tirkîye bike, lê ne di şerê li dijî Kurdan de, lewre Kurd ne dijminê Îsraîl in".

'Amojgariyek' bo Kurdan

Nûçeyen Derve- Kesayetiye berheliskarî Iraqi le London guti "Wilatî yekgirttuwekanî Emerîka amade niye helwîstî xoy le barey helgirtinî gemaroy abûrî le ser Iraq ewe heygire herçende İtalya û Fransa le naw Encûmenî Aşîfî da lem pênewe da xebat deken". Herweha em kesayetiye guti "Esta Wilatî Yekgirttuwekan le barey çakgirdinî barî abûrî Kurdan le bakûrî Iraq dekolêtewê û niyazi waye herdî amêri niwîyan bidatê bo damezrandinî pîsesaziy ewto ke Kurd bitwanin barî giranî tengijey abûrî xoyanî pê sûrî bikin". Heman kesayeti, amojgariy berpirsiyaranî Kurdi Iraqi kird bo ewey karêkî ewto neken bibête mayey turekîrdinî Turkiya û wilatanî tîrî dirawsê, herweha amoje bo hiç şitêk neken ke bonî serboxoyî û damezrandinî dewletî serboxoyî Kurdanî lê bê le Rojhelatî Nawerast da. Govari ELWESET (be Erebî) Jimare: 95 le 22-11-1993

Civîna CE'yê qediya

Nûçeyen Derve- Civîna Wezîrê Karêne Hundîn û Dadiyê yê Civata Ewrûpayê (CE) li Brukselê di 30'ê Mijdarê de qediya. Di kombûna welatên CE'yê de Spanya û Holanda ìmze navêtin bin xalê der mafê pena-ber û karkerê koçberan de. Konseya Civata Ewrûpayê ji bo ku di 10-11'ê Kantûn de pêşkêsi civîna CE'yê ya ku wê serokê dewlet û hikûmetan besdarî wê bibin, planeke livbaziyan amade kir. Plana livbaziyan ku tê de mubadelekîrîna sütardan di navbera welatên endamê komê tê xwestine hate hîn bûn ku di serî de Spanya û hin welatên endam ìmzeyâ xwe ji wan madeyan kişandine. Ji aliye din ve tiştê ku rayedarîn Tirk jê hîvî dikirin, biryara qedexekirina PKK'ê li nav sînorîn CE'yê derneket. Rojnameya Yewnanî Etnos ku a-ligirê desthilatê tê nasîn idia kir ku, bi têkiliyîn Yewnanîstanê biryara qedexekirin û îlankirina wê ya ilegal nehatîye derketin û bûyer bi navê "Şeqama li Tirkîye" da. Rojnameya Mesînîn gote ku di civîne de Wezîrê Per-gala Dewletê yê Yewnanîstanê Stelyos Papatemelis nehiştiye ku li dijî PKK'ê biryarek di nav we-laten endam de derkeve.

'Almanya dûjiminayetî gelî Kurd deka'

Nawenda Nûçeyan- Ew biryarey ke hikûmetî (Bonn) sebaret be gemarodanî, çalakiyekanî PKK dabûy, diwêne le derewey Almaniya kardaneweyî gewrey be xowe bînî w le rîkxirawê Kurdêkanewê (taybet le Paris û Biroks) hereşey tûnd û tîj le berjwendêkanî Almaniya kra le Aûrûpa...

Herweha hereşey tole sendinewe lew kesane kra ke be mebestî gestûgûzar le Aûrûpa dêne Tirkîye.

Le katêkda (çawdêranî siyasi) way debînin ke ewe hewlî berpakrdinî (şerêkî abûrîye) le hemberî Tirkîye, qisekerêk be nawy (PKK) ewe le Paris le a-gadarkrdineweyekda raygayan ke salî 1994 tûndû tîjîr û dijwartir debêt bo ew kesaney be mebestî gestû gûzar dêne Tirkîye. Herweha qisekerêk "Kanî Yilmaz" le çawpêkewtnêkîda legel TV Ferensada (Frans-3) witî: Kurdekan twanay parastinî jiyanî ew

kesaneyen niye ke bo geşt û gûzar rûw le Tirkîye deken. E-mew qisekerêk le dirêjey qisekanîda witî: Ew kesane be hûkmî ew paraney ke deyhînîne Tirkîye debine hawkar û cûlênerî ew şer û qesabxaneyey ke hikûmetî Ankara dijî Kurdekan cêbecêy dekat.

Le beyannameyekî (lêjneye Kurdistan-Baljika) ke le Broksil hate blawkrdinewe, rageyendra ke biryarî Gemarodanî Almaniya dijî çalakiyekanî PKK hawkarî Tirkîye dekat lecino sayîdi Kurdda.

Le layekî trewe 'Kanî Yilmaz' qiseker benawy (PKK) e-we le Aûrûpa witî: kardanewew lehember westandinî gelî Kurd le ser damezraw û balwêzxanekanî Tirkîye le Aûrûpa dijî ew qesabxaneyeye ke leşkîrî Tirk le Kurdistanda ber-pay dekat, herweha witî. Be dilniyayıwe deng û piştgîri xoman dedeyne pal mangrtîni mîlletekeman le Aûrûpa.



Le Parîsîş komelêk le girêdi-rawanî PKK hereşey tolesendînewyan le Almaniyaw berjwendêkanî Krd. (ARGK) le be-yannameyekîda ke le paytextî Ferensa Blawî krdewe tiyaya hatiwe: Pêwyste' Almaniya ewe bzanêt ke tevgerêkî wekû PKK be hereşê w gemarodan tûşî nûşustî w wire berdan nayet.

Her weha (lêjneye Kurdistan-Baljika) Beyannameyekî tirî

(ARGK) bilaw krdewe ke tiyaya hatiwe: Em gemarodane le zûlm û zorekanî (Edolif Hitler) deçê dijî gelî Yehûdî herweha le beyannameke da hatiwe: ke Almani yarmetî Tirkîye dedat le qetlüamî gelî Kurda cûnke leşkîrî Tirk tank û topî Almaniye le dijî Kurd bekar dênen.

Rojnamey Al-Seriq, Al-ew-set

Jimare (5479) 28.11.1993

Serokê KNA'yê Mandela:

'Heke wiha biçe em dê eniyeke anti-faşist ava bikin'

Nûçeyen Derve- Serokê Kongreya Neteweyî ya Afrikayê (KNA) Nelson Mandela, roja sêsemê (30'ê Mijdarê) daxuyand ku, heke dijberên wan doza veqefînê bikin divê ew jî eniyeke anti-faşist ava bikin.

Wek tê zanîn hêzên nîjadperest piştî lihevkirina Mandela û Serokê Afrîkeya Başûr De Clerk li ser qanûnekî bingehîn a nû û li ser hilbijartineke bêşînor ku dê desthilatdariya KNA'yê û nûnêrê wan i herî mezîn KNA'yê bi xwe re bîne, dengê xwe li hemberî vê lihevkirinê bilind kirin û doza veqefînê kirin.

Li gorî vê lihevkirinê diviya-



Nelson Mandela bi De Clerk re

bû aştî bihata, lê hêzên nîjadperest vê yekê nafejîrinin û şerê qirêjî didomînin. Li dû lihevkirinê hinek reşikên kevineperest û spiyen nîjadperest rîveberiya

KNA'yê gotin ku ew tu car vê yekê naxwazin, nahêlin ew bi rîk û pêk bimeşe û hinek mirovîn spî jî ji bo kû nekevin bin rîveberiya reşikan, dest bi koçê kîrin.

Mandela roja 30'ê Mijdarê li Cape Townê di axaftineke xwe de rexne li "Hevkariya Azadiyê" ku rîexistineke reşikên kevineperest û spiyen nîjadperest e, girt. Gelek rîexistin di nav refî vê hevkariyê de cih digirin, ji Partiya Azadiyê ku ji qebileya Zuluyan pêk hatiye bigirin heta partiya nîjadperesten spîyan "Eniya Gelêrî ya Afrikâner". Ev partiyen di nav refîn vê

hevkariyê de her yek ji bo xwe doza dewletteke serbixwe dike. Ew dîbêjîn ku, heke ew daxwaza wan neyê cih ew dê şerê hundîrin derxînîn.

Li aliye din azadixwazên di nav refî KNA'yê de jî rexneyên tund li Mandela digirin, ji ber ku gelek mirovîn azadixwaz bi destê nîjadperestan têk kuştin. Ew di vê baweriyê de ne ku hikûmeta De Clerk li pişt wan rîexistin tarî ne û divê KNA jî li dijî van şerê çekdarî bimeşîne, lê Mandela bêyî stendina dengê wan, dev ji şerê çekdarî berdaye û baweriyâ xwe bi rîveberiya nîjadperest tîne.

Semînerek li ser DEP û rewşa Kurdistanê

Bavê Şêro

Berlin, Welat- Roj bi roj êrîşen mezîn diçin ser gund û bajarê Kurdistanâ Bakur, bi dehan û bi sedan mirovîn me têne kuştin û birîndarkirin û bi hezaran jî têne girtin û koçkirin.

Karbidestêne dewleta Tirk jî, ji sibehê heya evarê li ser "demokrasiyê", deng dikin. Ew geleb ber xwe didin ta ku rejîma Tirkî li pêşîya cîhanê wek hikûmeteke demokrat nîşan bidin. Di vî warî de ne tenê rejîma zordar, lê belê navgînên nûçeyan jî roleke mezîn û eşkere dîlîzin. Da ku em karibin bi zanebûn li pêşîya propaganda ya dijmin rawestin, derewên koldarîn ji raya gişî re eşkere bîkin, me biryar standin ku em karê nûçevaniyê û pêwendiyen derve xurtîr bikin. Ji bo vê yekê me li ser navê Yekîtiya Rewşen-

bîrên Welatparêzên Kurdistanê (YRWK) saloneke mezîn di Mala Çandêن Cihanê de (Haus der Kulturen der Welt) li Berlinê girt, ji bo semînerekî mezîn di roja 13.11.1993 yan de.

Ji ber ku şandîye parlemanê Mehmet Sîncar û hevalîn wî endamên DEP'ê hatin kuştin û Yaşar Kaya Serokê DEP'ê hate girtin, me xwest nûnerekî DEP'ê ku şandîye parlemanê be, were semînerekî bide, lê mixabin ji ber dijwariyên partî û ji ber dijwariyên ku dewleta dagirker bo endamên DEP'ê derxistin, ew nikaribûn bi-hatana semînera me. Dîsa jî dora 300 mirov di semînerekî de besdar bûn. Semînerekî bi vî awayî pêk hat:

- Cafer Çiçek Endamî Komîteya DEP'ê li Agirî, li ser dîrok û rewşa DEP'ê ya rojane deng kir.
- Oktay Yıldız Berpirsiyare

Kurd-Ha'yê axaftina xwe li ser navgînên nûçeyan û li ser bû-yerên nû yên li Kurdistanê kir.

- İsmail Özden endamî Meclîsa Neteweyî bi navê ERNK'ê, li ser taybetiyen rewşa siyasi li Kurdistanê û li derveyî welat sekînî.

- Dr. Gundî semînerekî dîgerand û Selim Ferat jî karê wergerânîn dîkir.

Beşdarîn semînerekî dengê xwe dan ji bo deranîna bangekê (daxwaznameyekê) ji raya gişî re. Di vê bangê de ev xalê jîrîn hene:

- Dengê xwe bilind bikin li dijî êrîşen leşkeren Tirk ên barbarî û li dijî hilweşandina gund û bajaran, li Kurdistanâ Bakur.

- Dengê xwe bilind bikin li dijî sandina çekan û alîkariya leşker ji bo Tirkîye.

- Dengê xwe bilind bikin li dijî pêlêkirina biçûktîrîn mafêni miro-

van li Kurdistanê.

- Têkevin nav alîkariya madî û manewî ji bo qurbanîn şerê taybetî li Kurdistanê.

- Em ji mirovîn li Almanyayê û li Ewrûpayê dixwazin ku wek gervan (tûrîst) neçin Tirkîye, ji ber ku bi alîkariya pereyên wan şer têne domkirin û bêhtir mirov têne kuştin.

- Em ji navgînên nûçeyan û rîexistinê mafêni mirovan dixwazin ku bêhtir rojnamevan û dele-geyan bişînîn Kurdistanê, da ku ew rastiyê li ser kuştinê tevayî û li ser cinayetkarîn di yên dewleta Tirk û encamîn şerê taybetî bini-vîsin û belav bikin.

Pîstî sê saet û nîv, axaftin û danûstandinê germ û ji dil û can, semînerekî li ser hîvî û daxwazîya hevdîtinan di gelek semînerekî ku di rojîn pê de hate girtin

KT'ê Başûr bombebaran kir

Balefirêñ Artêsa Tirk. rojêñ 29 û 30'ye Mijdarê li 9 herêmên başûrê Kurdistanê operasyonek pêk anîn. Li gorî daxuyaniya hikûmeta Tirk operasyon li diji wargehêñ PKK'ê pêk batine. Lî nûnerê PDK'ê yê Enquerê Sefin Dizayî daxuyand ku li deverêñ hatine bombebarin wargehêñ PKK'ê nîn in. Li gorî beyana PDK'ê di bombebaranan de li herêma Haftanîn. deverêñ Mezi. Karyaderî. Singî û Sîve 3 gundiñ hatine kuştin. 6 zarok ji birîndar bûne.

Cavkaniyêñ gerîlayan. piştî bombebaran diyar kirin ku. tu zayıfatêñ wan nîn in û balefirêñ Tirk ji gelek bilind ve bombeyêñ mîsket bi kar anîne û ji hin bombeyan dûmenêñ zer hilkiyaye. Nûnerê PDK'ê ji êrişen KT'ê protesto kir û ji Tirkîyeyê daxwaz kir ku tazmînatê bide kesen zirardîti.

Serokwezîra hikûmeta Tirk Tansû Çiller jî. piştî bombebaranê civînek ji bo çapemeniyê li dar xist û daxuyand ku dê êrişen bi vî rengî bidomin.

70 leşkerêñ pispor fîrar kirin

Roja 29'ê Mijdarê ji Fermandariya Alaya 2. ya Mîdyadê ku li ser Merdinê ye. ji ber ku qomitanañ jê daxwazêñ ji derî mirovtyê kirin 70 leşkerêñ pispor fîrar kirin. Ev leşker di eynî rojê li dora Qereqola Soğukkuyu ku. li ser navceya Qoserê ye hatin girtin.

Leskerekî ji eynî alayê bi telefonê ev agahî da rojnameya Gündemê: "Fermandarêñ me ji me dixwazin ku em li gel zilmê bikin. qirkirin ji tê de hemû metodêñ hov bi kar bînin. hevalêñ me li diji vê daxwazê rabûn û fîrar kirin. Bi vê kîna xwe. ew daxwaz protesto kirin. wan dil hebû ku herin Enqereyê. serî li Fermandariya Gisti ya Artêsa Tirk bidin."

Rojnameya Hurriyetê ji bi awayekî ne durist. ciheki bicûk da vê bûyerê. Li gorî vê rojnamayê sedema fîrarê: "Leskerêñ pispor nedixwestin ku qomitanañ wan û leşkerêñ normal wek hev bibînin. bi eynî cavî li wan binêrin" bû.


Cinayetê kontrgerîla

Navenda Nûçeyan- Kontrgerîla cinayetê xwe yên li hemberî welat-parêzêñ Kurd didomîne. Di van rojêñ dawîn de. zêdeyî 20 kesan bi destê kontrgerîla hatin kuştin.

Serokê DEP'a Tûxê (Tetwanê) Şevket Epözdemîr roja 26'ê Mijdarê ji aliye polisîn sivîl ve hate revandin û dû re cesedê wî hate dîtin. Berçavka Epözdemîr li ber deriyê avahîyeke leşkerî hate dîtin. Serokê DEP'a Tûxê Şevket Epözdemîr. gelek caran hatibû tehdîtkirin û der mafê wî



Şevket Epözdemîr



Adnan Işık

de ji aliye dâdgeha Tûxê ve biryara girtinê hatibû stan-

din. Roja 27'ê Mijdarê ji be-

lavkarê rojnameya Özgür Gündemê Adnan Işık li Wanê bi êrişâ 4 kesen çekdar hate kuştin. Kesên ku

Adnan Işık kuştin bi du erebeyen sivîl ên ku her tim li ber deriyê Emniyeta Wanê têne dîtin. ji cihê bûyerê reviyan.

Li aliye din. li Batman û Amedê ji êrişen kontrayan ji nû ve zêde bûn. Bi taybeti li Batmanê her roj çend kes bi êrişen kontrayan têñ kuştin. Cinayetê kontrayan li metropolên Tirk ji sift bûn. Nemaze li Mêrsinê cinayetê sistematiç pêk têñ. Di vê heftiya dawî de li Mêrsinê 4 kes bi destê kontrayan hatin kuştin.

Yewnanîstan: 'Tirkîye despot e'

Navenda Nûçeyan- Li gor Cîgirê Wezîrê Karêñ Derveyî yê Yewnanîstanê Theodoros Pangalos. dewleta Tirkîyeyê despot e. Pangalos di çuyîna xwe ya Îngilîstanê de wiha got: "Ez bi xwe li hemberî livbaziyêñ PKK'ê yên tundî me. Lî. ji xeynî vê livbaziyê tu riyen din ji bo Kurdan tune ye. Ma li diji dîktatoriyê. bikaranîna parastina mafan bi riyen aşti mimkûn e?" Her wiha dibêje Pangalos: "Em çiqas li hemberî livbaziyêñ bi tundî bin jî. em nikarin ji Kurdan re bibêjin dev ji tékoşîna xwe berdin."

Pangalos. axaftina xwe wiha dom kir: "Gelêñ Kurd mafêñ xwe. bi riyen aştiyê nikarin bi dest bixînin. Îcar. em (Ewrûpî) dikarin ci tawsîyeyî wan (Kurdan) bikin?" Wek tê zanîn ku çapemeniya

Tirkîyeyê idia kiribû ku. "Yewnanîstan alîkariyê bi PKK'ê re dike." Li ser vê yekê ji Theodoros Pangalos. çapemeniya Tirkîyeyê tewanbar kir û da xuyakirin ku ew nûçe ne rast in.

Li milê din Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistanê (ERNK). ji bo piştgiriya ku Pangalos bi gelê Kurd kiriye û rexneyen ku li Tirkîyeyê girtiye. spasdariya xwe pêşkêş kir.

Hikûmeta Tirkîyeyê. li ser vê da xuyaniya Pangalos. Yewnanîstan protesto kir. Piştî vê protestoyê ji Pangalos bi beyanatekê wiha ber-siv da Tirkîyeyê: "Tu mafêñ Tirkîyeyê tune ku rexneyan li min bigire." Wer tê xuyakirin ku di pêşerôjê de têkiliyêñ Tirkîyeyê û yên Yewnenîstanê. dê ber bi ne xwesiyê ve herin.



Theodoros Pangalos

Daxwaza girtina DEP'ê

Navenda Nûçeyan- Der heqê Partiya Demokrasiyê (DEP) de ji aliye Serdozgerê Dadgeha Bilind ve doza girtinê hate vekirin.

Serdozger. bi idîaya. "Li diji yekîtiya welat û neteweyê. lebatêñ bi hinceta cudaxwaziyê ku hatibûn kirin" doza girtinê vekir. Serdozger. sedemê doza girtinê bi vî awayî nîşan da: "Banga aştiyê ya DEP'ê û axaftinê Serokê Partiyê Yaşar Kaya ên li çend ciha ku kribû."

Heke ku DEP bê girtin. dê mebûstiya 17 mebûsen vê partiyê ji bikeve û li gor qanûnen Tirkîyeyê ji ber ku hejmara kursiyen vala dê bigihîje 24 an û wê hilbijartina gisti ya bîlez pêk were.

Em we ji bîr nakin

Belavkarê Rojnameya Özgür Gündemê
Adnan Işık û Serokê DEP'a Tûxê (Tetwanê)
Şevket Epözdemîr ji hêla dijminêñ mirovahiyê ve hatin qetilkirin. Em lanetê li van cinayetê hovane tînin û her kesî(ê) ji xwe re dibêje mirov dawetî helwestkariyê dikan.

Xebatkarêñ Rojnameya Welat

Li Ewrûpayê barbarî hêşîn dibe

‘Danke barbar Herr Kohl’

S.S. Dilpolo

Ewrûpi gelên paşverû, kevnerest, olperest, nezan û barbar wek gelên Rojhilata Navîn dinasîn. Ji destpêka mirovahiyê ve li ser axa dinyayê barbarî di-dome. Bi pêşveçûna mirovahiyê re gelek qewm û welat bi pêş ve cûn, fêri bajarvaniyê bûn, lê di rastiyê de ji barbariya xwe tu carî rizgar nebûn; iro ev welatên han xwe bajarvan û welatên Asyayî ji barbar dibin. Ji aliyê din ve ji bi metodên kolonialistî welatên Asyayî û deverên din bi xwe ve girê didin.

Dewletên Ewrûpi, Rojhilata Navîn û Afrîkayê ji xwe re wek warê cengê hilbijartine. Di nav van welat û gelan de her tim dubendî derxistine, gelan berî hev dane. Bi milyonan mirov ji bo ku çekên xwe yên nû biceribin û bifroşin welatên paşvermayî, bi hev dane kuştin.

Serê di navbera Îraq û Iraqê de zêdeyî-deh salan domandin. Li Afxanîstanê hê ji ceng e. Pişti rawestina serê Îran û Iraqê. Kurd li Helebce bi destê rejîma Sedam dane kuştin, dûre Iraqê berî ser Kuveytê dan ji bo ku Iraqê bi temamî bikin bin kontrola xwe. Di vê armancê de bi ser ketin, niha ji li Soma-li, Koreya Bakur û Haïti provakasyon û qetliamên xwe didomînin.

Ewrûpiyan Kurdistan ji ji xwe re kirine hedef. Hêza rizgarixwaz a Kurd, li ber berjewendiyê yên li Rojhilata Navîn wek xetereyek dibin û ji bo vê ji êrîşî ser saziyên Kurd ên li Ewrûpayê dikan. Danûs-

tandinên Almanya û Tirkîyeyê ji, wek di dema Hîtler û M. Ke-mal Atatürk de her diçe xurttir dibin.

Kurdên ku ji ber zilm û qetliamên li Tirkîyeyê reviyane û xwe spartine dewletên Ewrûpi, iro bi zilm û zora Ewrûpiyan re rû bi rû dibin. Berê, Ewrûpi dema ku zilma dewleta Tirk dibihîstîn, digotin: “Uüssjj barbar Turker” (Üşş Tirkê barbar). Lê tu carî barbariya xwe nediditîn û xwe wek sembola bajarvaniyê diditîn. Iro ev bajarvaniyâ bilind (!) êrîşî Kurdan dike, Kurdan digire û teslimî Tirkîyeyê dike. Fransa 6 kesen ku bi PKK vaniyê tewandar dike, dide Tirkîyeyê. Gelo Mitterrand’ê demokrat (!) hay ji vê rewse tune ye? Kirinên vê dwiyê yên dewletên Ewrûpi barbareñ, rasteqîn nîşanî dinyayê dan.

Barbar peyeke Latînî ye ku bi giranî ji bo Almanan hatiye bikaranîn. Dema ku Hîtler ji bo dinyayê dagir bike dest bi êrîşan kiribû, Fransa îlheq kiribû, Swêd seranser xistibû bin potinên xwe, ji ser dilê Norweçîyan re derbas bûbû, bi dehhe-zaran Poloni di déran de bi zinditî şewitandibûn, riya wî bi Yewnanîstanê ji ketibû. Dema ku leşkeren Hîtler Yewnanîstanê dagir dikan, gelê Yewnanî dil digirin û ew di zevî, debr û kargehîn xwe de dixebeitîn. Leşkeren Alman bi Yewnanîyan re bi zimanê xwe dipeyi-vin, bi ser wan re borînî dikan, dixwazin wan bicivînîn, lê Yewnanî ji wan tu tişti fêm nakin. Ji hev dipirsin: “Ev ci bare bara wan e?” Ü nacivin. Li ser vê



yekê leşkeren Hîtler wan didin ber gullebaranê û ji bili çend kesan tu kes ji vê qetliamê xelas nabin. Ên ku xelas dibin ji, direvin û xwe digihîjînin ku derê dibêjin: “Birevin barbar hatin”.

Dema ku mirov ev tişt bi bîra Almanan dixe, serê xwe pêl dikan û ji bapîren xwe şerm na-kin. Lê barbariya mezinên xwe yên ku iro her yek ji wan bûye Hîtlerek nabînin.

Almanya ji bo berjewendiyê xwe, mafêni mirovan û demokrasiyê danîne aliyeke û ev gotinên ku di devênen xwe de

kiribûn benîş bi bir naynin. Tirk û Almanen ku ji bav û ka-lan ve dostê hev û din in, iro barbariyê bi awayekî vekirî û bi hev re dimeşînin. Wisa bûye ku rojnameyên Tirk, mesajen xwe yên ji Almanya re bi Almani dînîsin û dibêjin: “Danke Herr Kohl” (Spas Kohl Beg).

Çendekî berê, Neo-naziyeKİ Alman bi qerewata Kohl digire û zengeloka Kohl dişidîne. Parêzvanen Kohl bi zilamê Ne-onazî digirin. Helmut Kohl pişti ku qirika xwe ji destê faşistî Alman xelas dike dibêje: “Vî naletiyê han ji ber cavênen min bi-

bin, ji xwe rengê Hîtler lê dike-ve.” Ev dimenek rola şanoya Kohl bû û di televizyonan de ji hate weşandin û jê re di qada navneteweyî de bû pûaneke mezin. Lê dê Kohl niha pûanê barbariyê bistîne, ne yê demokrasiyê. Gotineke Almanan heye, dibêjin: “Das ist nicht demokrasy lediglich brokrasy” (Ev ne tu demokrasi ye, lê birokrazi ye). Vê carê ev ne mafparêzî, lê Hîtliperâzî ye.

Em hêvîdar in, ku ew kesen ku welatên Ewrûpayê ji xwe re wek piştek diditîn, hişê wan hatibe serê wan.

Ola îslamê û oldarêne welatê bindest

Halîl Kurt

Dema ku ola (dînê) îslamê hatiye avakîrin û hetanî dema i-ro: Pirsên wek, “misilman kîne, kafrî kîne, misilman cîma misilman in, kafrî cîma kafrî in, şertê misilmantiyê ci ne, misilmanen sexte kîne, ê rast kîne, wekîlîn dînê îslamê kîne, alim kîne, ê ne alim kîne, cîma dewletê mele bi meaş ve girê dan?” berdewam bûne. Ez dixwazim van hinek bînim zîmîn.

Kafir kedxwar in, dagirker in, zîmlîkar in, xwînxwar in û xwedênenas in. Wek mînak yên ku zîlmî li Kurdistanê dikan. Heçî misilman in li hember zîlma kafrîn derketin û mafê feqîrîn bêmecal di-parêzin. Hz. Mihemed û es-habî xwe di sala 622 yan de ji Mekkeya Serîf vejetiyan cûn Medîneya Minawer bi qe-

bileya Ereban ve, Eyûk û Hazdarî re ketin têkiliyê û bûn heval.

Hz. Mihemed 8 salan bi Mekkeyê re şer kir û Mekke fetih kir. Heta wê demê ji li wan çolêن Ereban zarokên ku qîz bûna, bi saxîti dikirin nav qûmê û dikuştin. Pişti Hz. Mihemed kafrî safî kirin êdi ne-hişt ku zarokê qîz bîn kuştin. Ü ji dewlemendên ku sûc bi-kirina re digot. “Tê evqas kole azad bikî”. Ü bi vî awayî gelek kole azad kirin. Ü dînê îslamê bi zanekirin da. Ü di şer de misilmantiyê hûn gişt ji pê za-nin. Daxwaziya min ew e ku, hûn riya Hz. Mihemed rast bi-meşînin û miqabilê kafrîn derkevin.

Hz. Mihemed dibêje ku, “Ciranê te feqîr be, perîşan be, peywira-te, tu alîkariya wî bikî, wexta ku tu alîkariya wî neki tu xêra te qebûl nabe.”

Emê ji heta ku Kurdistan di bin destan de be û gelê me perîşan be gerek em pêşî alî-kariyê bi gelê xwe û welatê xwe re bikin. Em dinêrin îsal bi sed salan e li Kurdistanê zîlm dibe. Ew kesê ku dibêjin em wekîlen misilmaniyê nin û doza wê dikan, qet pêjna wan kesa nayê nabêjin cîma hûn li van misilmanan vê zîlm û hingavtinê dikan. Diherin ji yên wek Erbakan û Türkçe re di-

bin hevkar li bajarê wek Sten-bolê, Îzmîrê û gelek bajarê din xwepêşandan (miting) dikan. Ü dibêjin li misilmanen Bosnayê zîlm dibe dibêjin emê herin alîkariya wan birayêne me yên misilman bikin. Ü her ro wan tînîn zîmîn. Kurd, ev îsal hezar sal in tev de dizanîn zîlm û zorekiya ku li Bosnayê dikan, deh qat li Kurdistanê tê kirin. Lê ew naxwazin ku qala vê, zîlmî bikin ew gelê Kurdistanê

misilman nabînin. Alimeki wek Seîdê Kurdi yê hêja, ji bo ku Kurd bû wexta ku wefat kir, neyaran meytê wî ji tîrbê revandin û nebedî kirin. Heta niha ji kes nizane ku tîrba wî li ku derê ye. Ew kesê ku mafê gelê Bosnayê diparêze û mafê gelê Kurd nabîne ew kes “misiltir” in! ne misilman in. Ev hezar sal e ku van gelê Kurd bi vê sextekariyê xapandise û fêde jê girtine.

Tîştek li zora min naçê, lê hinek ji me Kurdan hene, ku em ji wan re dibêjin bes e, bi-din dû van sextekaran, bersiva ku didin me, dibêjin, “Em misilman in” her wekî ku em ne misilman in. Ez ji wan kesen ku dibêjin ez misilman im re dibêjin, kesê ku şertê misilmaniyê neyne cih ew qet ne misilman e. Hûn misilman in, ger hûn şertê îslamê pêk bî-nin. Herin Kurdistanê li hem-

ber kafrîn û dagirkeran şerê berxwedanê û azadiyê bidin. Ku hûn bimirin ji hûn sehid in. Li wê dinyayê cihê we bi-huşt e, hûn cineti ne. Ku hûn neçin ji bes gelê me bi çirok û viran bixapînîn, peywirê ji kedxwaran re nekin. Wexta ku mirov ji tîştekî bawer bike û baweriya mirov pê hat, gerek mirov bike, wexta ku mirov nekê, mirov xwe dixapîne. Ew kesê ku bi ya ilmê xwe ne-ke, ew kes sextekar e. Ü li cem Xwedê ji gunehkar e.

Reformîstêrî tirsonek ji he-ne di rojekê de bi zimanê xwe Kurdistanê xelas dikan. Lê tu fêdeya wan li kesî nabê. Çavê xwe bér didin keda sehidan û li keda sehidan xwedî derdikevin, ew kes ji kedxwar in. Ew misilmanê ku xwe bi zîmîn dikê xelife û fêdeya wî ji gelê wî re tune be cudabûna wan û kedxwaran ji hev tune ye.



Ger hêvî nemîne, zewqa
jiyanê jî namîne.

Emile Zola
Romanivîsê Frensewî

KÊ ÇI PEKAND?

Wê PKK ji asîmanan ve bê teqîpkirin.

Mehmet Köstepen
Wezîrê Rêgîhandinê yê Tirkîyeyê

Kendalê Nezan ji halê Kurdan ci zane?

Torinê Osmaniyan, yek ji yên herî nezan û hov e li ser rûyê dînyayê. Nenêrin carekê bêhemdi dewleta Osmaniyan cend welat îsgal kirin. Jixwe ew jî bi destê qumandarên nezan ên bi eslê xwe biyanî jê re li hev hat. Lê gotine "Egitan bikuje, mafê wan nexwe!" Her cendi Osmanî nezan be û hê jî dema Fransiz behsa Osmaniyan dîkin dibêjin. "Tête de Turc"ango kenê xwe bi hovîtiya wan dîkin jî, ji aliyekî ve pîr pêkhatî ne. Tu kes bi qasî Osmaniyan zû nikarin nezanan, bi taybetî jî nezanen Kurd keşf bikin û bi xwe ve girê bidin. Ya xudatî, ev aliyê Osmaniyan hêjayî teqdirê ye. Ger ne Osmanî bûna wê kê karibuya zirnezanekî mîna Hikûmet Çetîn bîkiriya û bikira Wezîrê Karê Xâintiyê. An jî kê dikarî dinêkî wek Kamran Înanan ji Bîlîsê bianiya Enqerê û bikira Wezîrê Karê Neyartiya Gelê Kurd. Vêca bi lempê jî hûn biggerin, dikarin bêmejiyekî wek Mihemed Tahirê Navymen ji xwe re peyde bikin û bikin xulam. Gelo we dizanibû ku sergin ji di nav lepén Osmaniyan de Kurdiya xwe ji bir kir lê hînî Tirkî jî nebû ji xeyni gotinê qor. Bi kurtî, em dikarin bibêjin nezanen ku Osmaniyan ji xwe re kîrîne û hefsar xistine stûyên wan gis Kurd in. Ya xudatî me digot qey Osmaniyan di

nav me de nezan nehiştine, giş ji xwe re birine, lê paşî me dit ku me ji bîr kiriye ku hîna nezanekî Nezan di nav me de maye. Bes Xwedê ji Osmaniyan razî be, wan nezanê me yê dawî jî, li Parisê be jî, cûn dîtin û pêkhatibûna xwe ya di vî warî de careke din îspat kîrin. Lî bi rastî, tevi ku em vî aliyê Osmaniyan teqdîr dikin. Ew di peydekirin û keşfîkîna Kendal de pirr ewiqîn dereng man. Ji ber ku Kendal ji dûr ve gazî wan dikir, ji zû ve. Ji bo ku zû were dîtin, navê xwe ji danibû Nezan. Werhasil bi derengî be jî hev û din keşfî kîrin. Rebî li hev pîroz bin, emr û jîyê wan ta roja şoreşa Kurdistanê bidome! Pişti ku Serokê Artêsa Tirk Doğan Güreş ferman da endamên çapemeniya Tirk ji bo ku Kurdîn nezan bikirrin û yên din jî bigelînin, nûçevanê rojnameya Sabahê Hakan Tarstan ji lê da cû Parisê. Kendalê ji halê Kurdan nezan dît û jê cend pîrs kîrin. Nûçevanê Sabahê pêsi ev daxuyanî ji Kendal re kir: "Binêre Kendal, baş guhê xwe bide min û pasî bîpeyive. Rûpela me yê 21. wê tev ji bo te ye iro. Emê ji bo vê hevpeyvinê te bibînin jî, tu fêm dîki? Em dizanin tu meaşekî baş ji Fransuayan distînî lê, araqâ te heye, şara ba te heye, jiyanâ te ya şevê heye emê jî meaşek bidin te û du wêneyen te jî emê di rûpe-

la 21. de biweşînin. Tê hingê hînekî din jî meşhûr bibî û wan nezanen din ên gundî û nîvgundî li paş bîhêlî. Dibe cend dîlberen Osmanî jî wêneyen te di Sabahê de bi-

setê fêm nakim. Lî PKK qaqa ye. Ew mirovan dikuje.

Pîrsa duyemîn, tu ji Parisê hez dikî, armâanca te ci ye?


- Parîs xweş e. Tirkîyê jî

Berzaniyan, PKK zehf terorîst e. Jixwe qet kîfa min û kîfa kurê apê min Berzani jî, jê re nayê. Yaho ew, haşa haşa, serxwebûnê dixwaze. Dibêje, bêtêşbîh be, bila Kurdistanê serbixwe hebe. Na, na ez vê qebûl nakim. Dibe ku generalen me yên Tirk hînek qebûl bikin jî, lê ez naxwazim. Yaho jeopolitîka me ne musâid e. Zeviyê pismamê min û hînek jî yê bavê min li wir hene, heta em wan zeviyân nefiroşin û bi temamî li Parisê ji xwe re vîlâyete fireh li tenîsta Eyfelê negirin, ez qebûl nakim ku Kurdistan ava bike. Çar heb kurê xalê min û yên xaleta min jî vêga li Enqerê lesker in, ka bila ew jî werin vir ji xwe re bizewicin, hingê êdî bila generalen we bi PKK'ê re xeber bidin. Lî hûn bi ya min bikin dîsa jî ne baş e ku Kurdistan ava bike, inca bi destê PKK'ê!

Dawî tu ci dibêjî, ji bo Kurdîn nezan û Osmaniyan?

- Ez nezanê astîwaz û dijberê sêr yanî yê PKK'ê Kendal Nezan. Jixwe wa Kak Mesut ji xwe re û ji me re Kurdistanek ava kiriye, ew ji serê me û nizanim ciyê me zêdetir e. Xwedê ji Tirkîyê razî be ku carina pere dide Mesut. Gotina min a dawî jî ev e. PKK qaqa ye. Mersî boku. Cok teşekur.

M. Rojava



bînin û dil berdin te. De êdî xeber bide pîrsa min a yeke- mîn ev e.

Tu li Parisê ci dîki? Xwedê neke qey tu Kurdan diparêzî an jî tu lêkolînan dîlêkolînî?

- Pêsi ez vê bibêjîm. Dewlet ji PKK'ê çêfir e. Pişti vê rastiyê, êdî ez dikarîm bidilrehî bîpeyivim. Hin lêkolînê min hene li ser zimanokê Kurdan. Ez hînek Kurd im. Lî ku qisûreke min heye, li min bîborin. Ez zêde ji siya-

xweş û Kurdistanâ Başûr jî hî- nek xweş e. Ez aştiyê, bira- tiyê û wekheviyê dixwazim.

Ête te tiştek ji bîr nekir?

- Haa! Temam hate bîra min. PKK aştiyê naxwaze ew zarokan dikuje. Bila kes li pey nece. Nezanî baş e. Tewsiya min ji Kurdan re ku tev bibin nezan û careke din PKK qaqa ye.

Pîrsa min a dawî der heqê PKK'ê. Ew terorîst e ne?

- Wiî, erê bi serê hemû

Jûjî...

Doğan Güzel



Navê romantîk!

Hêmin Mukiryanî behs dikir û digot: "Bi bîra min tê ku carekê bi hevalekî xelkê Silêmanî re -ku xelkê Silêmanî pirr gotinxweş in jî em cûn Yekîtiya Nivîskarêne Hewlîrê. Ew heval nivîskar û helbestvan bi min dan nasîn û got: "Ev Bîmar (nexwes), Zamdar (birindar), Medhos (gêj û sersem). Bêxew. Şîprêw (perîşan û şewş) û..." Min jê re got: "Keko! Te bi xelet ez nehanîme vir?" Got: "Çima?" Min gotê: "Bi Xwedê ev nexwesxane ye, ne ye- kîtiya nivîskaran e!"

Ka, bi rastî ev zîlm û zor e ku li me Kurdan hatîye kîrin, wi- sa li me kiriye ku navê wiha ne xwes ji bo xwe hilbijîrin. Ez gazî dikim li tev xoran ku êdî navê wisa ne xwes û tews li xwe daneynin."

Anîs



Ewrûpa bi paş ve diçe

Almanya, Welat- Di demeke ku pêdiviya Tirkîyeyê bi "serkevînê" hebû pêsi Fransayê di 18.11.1993'yan de saet di şesê sibehê de girte ser malên Kurdan û 120 kesen welatparêz girt. ziyanê mezin dan wan û pişt re bili 24 kesan gişt berdan. Dû re di 30.11.93' yan de komeleyen Kurdi Komîteya Kurdistanê û Federasyona Komeleyen Çand û Karkeran (YEK-KOM) girtin.

Almanya ji bi biryara 16 eyaletan ve. di 26'ê Mijdarê de avête ser mal. komele û saziyên Kurdi. 35 heban jê girt. Di nav wan komele û saziyên ku deriyen wan hatine morkirinê de. ajansa nûcayan Kurd-Ha. Weşanxane Agri-Verlag. Weşanen Serxwebûn û Berxwedan û Feyka Kurdistanê ji hene.

Wezîrê Karê Hundirin ê Almanyayê Manfred Kanther di

daxuyaniya xwe de sebebê deri radana komele û saziyên Kurdan bi hinceta ku. "PKK'ê livabaziyen tundi pêk aniye. qanûnê komeleyan ên cezayê daye bin piyê xwe û pergala dewletê xistiye xetereyê" ve. girê da.

Der ú dorén Kurd ú Alman kirenen hikûmetê wêk helwesteke siyasi lê ne hiqûqî nirxandin û daxuyandin ku wê li dijî biryare rabin û meş û xwepêşandan li dar bixin.

Hevalen me yên li Almanyayê qewmîn û bûyeran di cih de ditin. çavdér kirin ú bi gel ú rayedaran re hevpeyin çêkirin. Li jêre em cih didine nûcaya wan.

"Xebata PKK li Almanyayê hate qedexekirin...", roja 26'ê Mijdarê hemû navgînên ragiandin. ajansên nûcayan li ser ve

pirsê sekinin. Rojname, radyo û kanalên TV yê ev mijar ji xwe re kiran rojeva yekemîn.

Wezîrê Almanyayê yê Karê Hundirin Manfred Kanther, biryara qedexekirina PKK'ê bi fermi di civîneke çapemeniyê de anî zimên.

Li ser biryara hikûmetê. polis û hêzên taybeti seferber bûn. dest bi operasyoneke giştî kiran. Di serî de avêtine ser malên Kurden welatparêz. pişt re ji deriyen komeleyen Kurdan ên girêdayî Feyka Kurdistanê (Federasyona Komeleyen Karkeran ên Çandî. li Almanyayê) şikandin û hemû tiş talan kiran. Qamyonên polisan ji. ji pirtük. kaset. plakat û ji maseyên xwarinê hatine dagirtin. Polisan. ne tenê pirtükî li komeleyen. daktilo. fotokopi (makine). dahol û zirne ji bi xwe re birin.

Di heman demê de girtine ser Kurdistan Komîte û rojnameya Berxwedan ji.

Li gorî listeya ku Konsolosa Tirkîyeyê ya der barê welatparêzen Kurd de dabûne hikûmetê. polis û hêzên "anti-terorê" bi sedan Kurd ji nava nivîsê derxistin û ew bi kuştinê tehdid kiran.

Roja 26.11.93'yan hemû komeleyen Kurdan bi zorê hatine valakirin. Operasyonên wisa dijwar tenê li Cizîre dikarin werin ditin. Gelo. li welatekî weke Almanyaya "demokrat" ji dike ku were ditin?

Ji 35 komeleyen talankirî. komeleyen Frankfurt. Hamburg. Bremen. Kassel hatin morkirin. Vekirina wan hate qedexekirin.

Kurdan qedexekirin û morê hikûmeta Almanyayê nas nekirin. Roja 27'ê Mijdarê bi hezaran hemwelatiyên Kurd ên welatparêz li hemû herêmén Almanyayê posterên Serokê PKK'ê A. Öcalan. alén PKK. ERNK. ARGK'ê. wêneyen şehîdan ji malen xwe anîn û serê şefaqê berê xwe dan komeleyen.

Gel bi sloganên weke. "Biji Serok Apo. Ez PKK me. Tirkîye Terorist e!.. deriyen komeleyen xwe vekirin. zincirâ polisan şikanîn û derbasî hundir bûn.


Dewletê xwest pirozkirina serala PKK'ê ji qedexe bike. nikaribû. Di komeleyen xwe de. gel sersala PKK'ê piroz kir.

Careke din diyar bû ku ne tenê di firehiyê de. di tengasî û rewşen dijwar de ji gel xwendî li partiya xwe derdikeye. Reaksiyona xwe bi meş. livbazî û piştigiyen hîn xurttir nîşan dide. Ne tenê bi gotin. "PKK gel e. em PKK ne". di pratikê de ji pêk tîne.

"EZÊ MALA XWE BIKIM KOMELEYA PKK'ê"

Li Almanyayê rewşa hemû welatparêzan ku polisan avêtibûne ser malen wan. weke hev e. Derde wan yek e. Gotina wan yek bû: "Em qedexekirinê nasnakin. Bila biçin êrisen dewleta Tirk qedexe bikin..."

"Saet 3'ê şevê bû. Reqe req bi deriyan ket. Hêle hêlek hat. min



Li hember iewra Almanya ya ku malen mirovan dixe bin lingan, Kurden Ewrûpa bêdeng neman.

kumeta Almanyayê disekinin.

Li Hamburgê Kurdeki bi navê Seyid Ahmed ji Nisêbinê xwe şevitand. Benzin bi-ser xwe de rijand û agir berda xwe. Di hundire komeleye de Kurd û Alman bi hev ketin. Bi zorê agir vemirandin. Seyid Ahmed nehist ègir vemirinin. Wiha bang kir: "Min berdin. Nêzîkî min nebin. Ji bo partiya xwe. ezê xwe bisewitînim. PKK em in. em PKK ne! Bizanbin em canê xwe ji didin Serok û partiya xwe!.. Kirina Apê Seyid Ahmed. nîşaneke fedekarî û yekkirina gel û PKK'ê ye.

Niha li gelek komeleyan. ciwanan bîdonen benzînê amade kiriñe. yan xwe disewitînin. yan ji polis ji komeleyan derdikeyin... Tercümanek ji bi xwe re anîbûn. Min jê pirsî: "Ev li ci digerin?" Got: "PKK qedexe bûye." Hemû pirtük. al. posterên Serok û şehîdan bi xwe re birin. Nasnamaya min ji. ji min standin.

Keça min Bêrivanê (5 sali), de ma ku sileh xistine serê min. pirsî: "Bavo. ev leşkeren Tirkan in?"

Roja din ez cûme qereqolê. Deh caran pişta min li diwêr xistin. Ji min xwestin ez hevkariyê bi wan re bikim. yanî bibim ajan. Lî hema ez bavê Ferzende me. li qereqolê min weke çavên xwe partiya xwe parast.

Bila kesek xêman nexwe. Heke komeleyan kilit bikin ji. ezê mala xwe bikim komele..." digote me Kurdekkî welatparêz.

Berpîrsiyarê rojnameya Berxwedan ê Nîşaran Oktay ji. rewşa xwe wisa ji Welat re şirove kir: "Min hew dit derbasî hundir bûn. Projektor dane çavên min. edî tiştek nedihate ditin. Ji nişkê ve qêriyan. Dixwestin bi psikolojiya min biliżin û min bitîrsin."

Desten min girê dan. serê min xistine ciwaleki û dest bi operasyonê kiran. Bawer bikin. vê terora wan Hitler anî bîra min.

Nêzîkî nîv saetekê ez wisa histim. Car caran ji pêl pista min dikirin. bi potinê xwe li serê min dixistin. Weke filmên polisi. her tiş bi xwe re birin. Sev bû şeva talankirinê. arşîva me serebinî hev kiran..."

Li gorî ku xuya dibe. wê Kurd Wezîrê Almanyayê yê Karê Hundirin neçar bikin ku gava xwe pas ve biavêye û li biryara xwe posman bibe. Kurd xwe ji bo rojén hîn dijwartir amade diken.

Mesaja we ji gel re.

- Kurtkirina yekîtiyê: firehkirina xebatê. parastin û mezinkirina partiye tê xwestin. Em ji berê bêhîr bibin xwediyen partiya xwe. Ev biryaren zarokan nikarin me bitîrsin. Partiya ku búye gel edî qedexe nabe. ne mimkûn e. Em xwe ji bo rojén hîn girantr amade bikin..."

Xebata PKK li Almanya berdewam e. Weke ku gelê Kurd ev biryara nebibîstibe. Xuya dibe ku kenê Cillerê tenê moraldayinek e.

ROJEVA WELÊT

Serfiraziyên (!) biçûk

Pîrsîgirêka Kurdi her diçe rojeva dinyayê hinekî din ji dadigire. Têkoşîna rizgariya Kurd a derengmayî, ji bo gelên bindest û çîna karker a dinyayê deriyen nû vedi ke û bi taybeti li Rojhilata Navîn ji bo şoreşike mezin rîbertiyê dike û dibe hêviya pêşerojê. İmperyalizm vê hêza mezin dibîne û li ber stratejiyên xwe yên bidestxistin û parvekirina dinyayê wek xetereyeke mezin dipejirine. Li aliye din, bi vê ji dizane ku nikare bi awayen leşkeri ré li ber vê hêzê bigire. Lewre ji bi komloû provakasyonan dixwaze wê bixe nav çarçoveyeke teng û şerê wê yê şoreşger bifetisine.

Welaleten împeryalist heta iro gelek caran ji bo bikaranîna vê armanca xwe komployan li dar xistine û bi alîkariya hin rîxistinê Kurd ên di bin kontrola xwe de riyan ceribandine. Lê, tu cari ji bi ser neketine. Iro ji, li gor bernameyeke hevpar êrişike bi giştî li dar dixin. Amerika weke her cari serkêşiyê dike, dû re ji Almanya û Fransa têne.


Êrisen ku li hember rîxistin û komeleyen Kurd ên legal ku li hin welatên Ewrûpayê pêk hatin, bêrêzbûn û bêqaydebûna împeryalizmê ji nîşan dan. Ji bo ku bikaribin rîxistin û komeleyen Kurd qedexe bikin, pê li qanûnên xwe kirin, demokrasiyê avetiñ aliye û qayde, "navneteweyî" ji nas nekirin. Armanca û planen wan ew bû ku, ca. 1500 têkoşîn Kurd bitîrsin û ji PKK'ê dûr bixin. Bi vî awayî ji pirsî, "ka Kurdi û PKK'ê ji hev vegetîn û bikin bin kontrola xwe. We. din, pesta xwe ya li ser hikûmeta Tirk ji tundtir diken, da ku ji pi, "îştehî Kurdi re çareseriyeke demokratik û çandî bê dîtin. Bi vî awayî hem li ser Tirkîyeyê û hem ji li ser Kurdistanê dixwazin vîn û kontrola xwe zeximir bikin."

Di eniya politikaya Tirk de êrisen Almanya û Fransa yên li ser komeleyen Kurd. weke serfiraziyeke diplomatik a hikûmetê hatin nîşandan û tu nema ku vê roja êrisa împeryalistan weke cejneke neteweyî ilan bikin ji bo Tirkîyeyê. Lê tenê aliye û pêvajoya nû pêşkêşî raya giştî kiran. Aliye din a daxwaza împeryalistan ji veşartin. Di rastiyê de gelek tiş ji raya giştî vedişerin. Wek ku ji bo vê tawîzî(!) ji dewleten Ewrûpi bistînin çîqas kanen Tirkîyeyê pêşkêş kiran?

Tevî her tişti pîrsîgirêka Kurdi ji her demî bêhîr di rojeva raya giştî ya navneteweyî de ye. Wek neyarêne têkoşîna Kurd, dosten wê ji zêde dijin. Êrisen Almanya û Fransayê ji, tu zîrare negihandine vê têkoşînê û împeryalist di planen xwe de bi ser neketine. Berevajiyê wê. hêza têkoşîna Kurd ji her demî bêhîr xwe da qebûlkirin. Bi dehhezaran Kurdên ku li Ewrûpayê niştehîn, li komele û rîxistinê xwe xwedi derketin û hemâ hemâ hemûyan ji nû ve û bi hêza xwe dane vekirin. Li aliye din, ji bo çareseriyeke demokratik û siyasi deriyen nû vebûn. Dijberîyen di nav Tirkîyeyê û dewleten împeryalist de xwe dane der û di pêşkêşî de. dê ev dijberî Tirkîyeyê di qada navneteweyî de hinek din ji bi tenê bîhîlin.

Tê ditin ku, divê mirov bi serfiraziyên(!) biçûk (an ji tişten ku wek serfiraziya mirov têne empozekirin) serxwes nebe û hinek bi aram li meseleyê bikole. Wê demê dê planen împeryalizmê baştı bêne dîtin.

Beriya Kongreyê DEP



Yaşar Kaya



Hatip Dicle



Mahmut Alinak



Mahmut Kılıç

- DEP ji bo ku bikaribe bikeve hilbijartinên herêmi yê di meha Adarê de kongreyeke awarte li dar dixe. Ji ber ku Serokê Giştî yê DEP'ê Yaşar Kaya di zindanê de ye, dê ji bo serokekî nû jî hilbijartin pêk were.
- Ji bo serokatiya giştî yê DEP'ê Hatip Dicle û Mahmut Kılıç berendamiya xwe ilan kirin. Mahmut Alinak ji yek ji berendaman e, lê hê jî berendamiya xwe ilan nekiriye. Serokê Giştî yê niha Yaşar Kaya jî, ji bo ilankirina berendamiya xwe li hêviya 7'ê mehê ye û di wê rojê de mehkemeya wî heye.

Navenda Nûçeyan- Kongreyâ DEP'ê ya Awarte germî û hêzeke xurt derxiste holê. Kongreyâ ku dê di 12'ê Kanûnê de pêk were, ji niha ve diyar dike ku dê di politikayen DEP'ê de û di awayê têkoşîna wan a li hember zîlîm û zora li ser gelê Kurd de guherînê giřing pêk werin. Ji bo serokatiya giştî ya DEP'ê heta niha mebûsê Diyarbekirê Hatip Dicle û mebûsê Pirînê (Adiyaman) Mahmut Kılıç berendamiya xwe ilan kirine. Navê Mahmut Alinak (mebûsê Şîrnexê) jî, di nava berendaman de derbas dibe. Lê Alinak hefta niha berendamiya xwe ilan nekiriye.

Li Navenda Giştî ya DEP'ê, amadekariyê kongreyê bi sifî didomin, mebûsên DEP'ê endamên Meclisa Partiyê û serokên bajaran roja 1'ê Kanûnê di bin Serokatiya Cigirê Serokê Giştî Murat Bozlak de civînek pêk anîn. Li gor agahîyan, di civînê de li ser politikayen DEP'ê yêni di pêşerojê de û li ser amadekariyê Kongreyê hatiye rawestin. Civîn nêzîki 7 saetan domiya û rexneyen giřing li serokatiya partiyê hatin girtin. Xwedîyen rexneyan diyar kirin ku, ta ni-

ha partî baş nexebeitîye, der barê Tirkîyeyê de politika neafirandîye û partî di nav gel de belav nekiriye. Di civînê de mebûsê Şîrnexê Mahmut Alinak daxwaz kir ku, serokên bajaran ji bo serokatiya giştî navekî tesbit bikin û di kongreyê de tenê ev nav bibe berendam, lê daxwaza Alinak a-ligir nedîtin. Piştî civînê hate daxuyandin ku, dê civîna du-yemîn beriya Kongreyê bi 2 rojan di 10'ê Kanûnê de çêbi-be.

BERENDAM ÇI DIBÊJIN?

Kesên ku, ji bo Serokatiya Giştî ya DEP'ê berendamiya xwe ilan kirine, xebatêñ xwe bi awayekî demokratik didomînin. Ji berendaman Hatip Dicle bi daxuyaniyeke ji bo çapemeniyê hedefêñ xwe diyar kire. Hatip Dicle di daxuyaniya xwe de diyar dike ku, berê xebatêñ wî li demokrasiyeke rasteqîn, li aştiyê û li berjewendiyen herdu gelan e.

Li aliye din der barê têkoşîna, ji bo dema nû de jî wiha dibêje: "Divê em partiyê li ser bingeha wê ya girseyî deynin. Ü divê parti hêza xwe li hemberî rejîmê bi kar bîne, Ger

partiyek bikaribe potansiyela xwe tevî hêzên dost bi rê bixe, hê dikare berpirsiyariyên xwe bîne cih. Wek mînak, hefta niha pirr nehatiye bikaranîn, lê divê em li ser metodên Mahatma Gandhî û liberrabûna sivil bifikirin û em dikarin çiqas ji van metodan fêde bîbin, hîn bikin. Yanê emê hêza partiyê bi têkoşîneke bêxwîn, bêtundî, lê bi livbaziyên girseyî derxin holê. Ji bo vê ji, divê em beriya her tiştî partiyekê bêkemâsî biafirîn. Ev xebateke dijwar e, lê ez bi hêvî me".

Hatip Dicle di beyana xwe de diyar kir ku di nav partiyê de ji hêzên Kurd û Tirk gelek dîtin hene. Lewre divê hemû dîtin bi awayekî demokratik bikaribin xebatêñ xwe bimeşînin.

Mebûsê Pirînê Mahmut Kılıç ji xebatêñ xwe yê berendamiyê didomîne. Kılıç di daxuyaniya xwe ya dawî de diyar kir ku, divê DEP'ê bo iqtîdarê bi dest bixe, bixebe. Mahmut Kılıç ev daxuyanî di civîna xwe ya bi serokên bajaran re de anî ziman. Mahmut Kılıç der barê DEP'ê de dîtin xwe pêşkêş kir û wiha got: "DEP'ê girêdahiye vê sîstemê nîn e. Em dixwazin vê rejîmê biguherînin û ji bo vê ji bibin partiyekê alternatif. Tevî her tiştî em mecbûr in ku li gorî qanûnan bilivin."

Mebûs, endam û rêveberên DEP'ê, dadixuyînin ku, ji bo serokatiye çiqas berendam hebin ewqas baş e û dê ev yok hêzeke nû bide partiyê.

Wisa dixuye ku, dê ev Kongreyâ awarte ji bo DEP'ê bibe destpêka pêvajoyeke nû û dê ji iro pê ve rola DEP'ê mezintir bibe.

Partiyekê din jî girtin

Dadgehê Qanûna Bingehîn, Partiya Sosyalist a Tirkîyeyê (STP) girtin.

Dadgehê bi hinceta ku, di bermameya partiyê de "cudaxwazî" heye, bîryara girtinê da. Girtina partiyê li gorî mercen zagona partiyêni siyasi ya 2820'î pêk hat. Partiya Sosyalist a Tirkîyeyê di daxuyana xwe de wiha got: "Ev bûyer êrişike bi zanebûn e li hemberî têkoşîna rîxiştina sosyalist a karkeran û refen wan i pêşeng."

Li Amedê qedexekirina dibistanan

Navenda Nûçeyan- Komîteya Eyaleta Amedê ya Eniya Rizgariya Neteweya Kurdistan (ERNK), li Kurdistanê bîryara girtina saziyên perwerdehî yêni weke unîversite, lise û hwd. di 30'ê Mijdarâ 1993'an de, li Amedê bi daxuyaniyekî ilan kir.

Daxuyanî, di 27'ê Mijdarâ de hatiye nîvisîn û bi imzeya Komîteya Eyaleta Amedê ve hatiye belavkirin.

NÊRÎNEK

Nîzamettin Toğuc

Konevaniya pûc

T ê gotin; "Ji neçarî mirov ji yarikê diya xwe re dibêje bavol!" Vê yekê li Komara Tirk der daye, tu omid û mecalâ wê nemaye, hewara xwe digihîjine Tahir Adiyaman.

Tahir axa serekê cerdevanê eşîra xwe ye. Di sala 1975'an de 7 leşker û dozgerekî KT'ê kuştiye. Li dadgeha Beytuşeoabê bi hejmara 1975/13'an bîryara girtina wî hatiye standin. Xwedîgiravî dewlet dardekirina wî dixwaze (!) Wekî hûn dizanin dewleta Tirk berî çend rojan ew Tahir Adiyaman û çend kesen wek wî (neyarê qewmê xwe) bi firokeyeke fermî anîn paytexta xwe û bi rayedarên dewletê re hevdîtin dan çekirin. Di pey re ji ew derxistin televizyonê û bi wan dane gotin: "Em demokrasiyê naxwazin, em Kurdayetiye naxwazin" û hwd. KT'ê careke din rûreşîya xwe dubare kir.

Ki ci dibêje bila bibêje, ev rewşa dervehî ya nû destpêkirî ji Kurdan re kar e ne zerar e. Berî her tiştî, gelê Kurd kete rojava dinyayê ya yekemîn. Kom û komikên navneteweyî giraniya xwe dan ser pirsgirêka Kurdi û wisa xuya ye wê zehf li serî rawestin.

Van rojan raya gelemperiya Tirk, bi konevaniyeke pûc a beredayî tê xapandin. Rayedarên dewletê wekî ku li derveyê welat koka Kurdan mer kiribin, didin nîşandan. Hikûmet ji aliyeke ve, muxalefet ji aliyeke ve bi lehengiya xwe dipeşînin (!) Bala xwe bidinê ne dûr, di nêzîk de wê kêfa wan li wan bişeriye. Vê gavê hişê wan li serê wan nîn e. Bi vê serfiraziya derveyê welêt a derewîn gêj û serxwêş bûne. Pêleyekê din hişê wan were serê wan, yê napişkan bikevin dor xwe êle beredaye.

Ki ci dibêje bila bibêje, ev rewşa dervehî ya nû destpêkirî ji Kurdan re kar e ne zerar e. Berî her tiştî, gelê Kurd kete rojava dinyayê ya yekemîn. Kom û komikên navneteweyî giraniya xwe dan ser pirsgirêka Kurdi û wisa xuya ye wê zehf li serî rawestin.

Almanya û Fransa ne ku heyrana çavên Tirkan ên reş û belek in ku vê helwestê dimeşînin. Ew herdu dewlet ji nanê xwe bi KT'ê dixwin. Kengê karê wan biqedê wê weke destmaleke qirêji wê biavêjin. Almanya ji bo giraniya xwe ya li Rojhîlat bide nîşandan û hinek çekên din bi firoşe KT'yê, Fransa jî, ji bo domandina firotina teyare û çekan çavên Tirkan boyax dikin. Ji ber vê yekê qet dilê xwe negirin û xemgîn nebin.

Derbênu ku pişta mirov neşkinin hêz û qewet didin mirov. Ji vê gavê û pê ve nema kes dikare pişta Kurdan bişkêne. Ji ber ku dara Kurdi vê carê di wextê xwe de kulîlk vekir. Bi ax û ava xwe mezin bû. Qurm û kokên wê ne bi tenê li Kurdistanê, li tewekê dinyayê belav bûn. Çend heb kurmikokê wê hebin jî, edî nikarin zewalê bîdinê.

Daxuyanî, bi sernavê "Welatparêzên Ciwanên Xwendekar ên Amedê" dest pê dike û bi kurfi ev tiştî tê xuyandin: "Li Kurdistanê saziyên perwerdehî bûne parçeyekî şerê taybetî. Mixabin saziyên weke unîversite, lise û hwd. gerek e di bin xizmeta zanistê de bin, lê iro ev sazî di bin xizmeta şerê taybetî de tê bîkarîn. Bi rasthatina salvegera avabûna PKK'ê.

me qerara girtina van saziyan da. Kesên ku li diji vê biryare derkevin, wê ji bo me bibin hedef. Di vê rewse de, em xwendekar û wezifedaran giş, ên ku ji xwe re dibêjin; ez şoreşer im, demokrat im, welatparêz im û însan im, dawetî pêkanîna vê bîryarê dîkin û li hemberî şerê qirêji ku li hemberî gelê me tê meşandin, wan dawetî cihstandina refen têkoşînê dîkin.

Çend gotin li ser gotinê pêşîyan

Gelo gotineke pêşîyan çawa dikane bi sedsalan, bi hezarsalan jîndar bimîne? Ew şîret û ew rastiya gelempere, çawa dikane bi gotineke kurt, bi hevokkekê were zimên? Civat ewqas diguhere, dikeve, radibe, têk dice, bi ser dikeve, xwe nû dike, dîsa ji metelok di civatê de her miteber dimînin. Li vir mirov dikane tişteki bibêje; bêguman her metelok di her pêvajoya civatê de derbas nabin, ango rastiyeke gelempere nabêjin.

Baran Rizgar

Dewlemendîyeke me ya hêja di warê gotinê pêşîyan de heye, bi hezaran metelokên me hene. Berî ku em hinekî kûr bibin, divê em metelokan şrove bikin. Metelok, an ji gotinê pêşîyan ci ne? Ji wan gotinê ku pêşîyan, ango bav û kal û pîran, ji dema kevin de gotine û di ser van re bi sedan an bi hezaran sal bîhurine. Lê dîsa ji di jiyana gel de hebûna xwe domandine re, metelok tê gotin. Sedema ku ji metelokan re bi Kurdi "gotinê pêşîyan" ji tê gotin ev e.

NAVEROKA METELOKAN

Lê gelo ewqas şrovekirin ji metelokan re bes e? Bê, guman na. Ji bili kevinbûn û ji aliye pêşîyan ve gotinê, naverokeke metelokan heye ku pirr taybeti ye. Anglo her tiştên ku pêşîyan ji kevin de gotine, nabin metelok. Divê ew gotin xwedî naverokeke taybeti ji bin. İcar ev naveroka metelokan a taybeti ci ye? Her metelokek gelempereyeke tîne zimên, an ji temiyekî (şışaretekê) dike. Mirov dikane bibêje ku dendika naveroka metelokan ev e. An rastiyeke gelempere tîne zimên, an ji işaretekê dike. Heta pirri caran, mirov dikane di hin metelokan de herduyan ji bibîne. Anglo him rastiekê gelempere tîne zimên, him ji temiyekê dike; dersekê dide.

Lê belê ji xêndî vê ji, hin taybemendîyen (xisûsiyeten) metelokan hene. Metelok gotinê kurt (kin) in, ew naveroka ku me li jor got, bi kurtî tê ziman. Pir caran bi hevokkekê. Gotinek an ji niviseke pirr dirêj, çiqas rastiyen gelempere tê de hebe û çiqas temiyan bike ji nabe metelok. Ew li gorî tewrê xwe dibe tişteki din. Ji bo ku bibe metelok, divê kurt, pirr caran hevokkek be.

METELOK CI YE?

Lê belê ev ji ne bes e. Tişteki din ji heye. Gotinek çiqas kurt, kevin, xwedî rastiyekî gelempere û şiretek be ji, dibe ku nebe metelok. Jibo ku bibe metelok, divê bi sedsalan, pirri car bi hezar salan jîndar bimîne û nasdar be. Divê di nav gel de were bikaranin û nasdar be. Anglo ew rastiya gelempere û ew şîret, gava ku rews cêbû, bi wê metelokê were gotin.

İcar pişti şrovekirina jorîn, em dikinan bibêjin ku metelok, gotinê pêşîyan ên kurt ên ku xwe diyê rastiyekî gelempere yan şiretekê ne ku, gel pirr caran tîne ziman û di nav gel de nasdar in.

Em dikinan vê şirovekirinê ji bi metelokekî bibêjin: **Bila hindik be, bila bila rindik be.** Ji xwe metelokên Kurdan hindik û rindik in.

Ka em di ronahiya vê şirovekirin de li metelokekî binérin:

Bextê Romê tune ye:

Em nizanin ev metelok çend sal berê hatiye gotin. Lê baş diyar e ku bi sedan sal kevin e. Em dikinan bi hesanî bibêjin ku bapîrê bapîrê me ji, bav û kalên me ji ev gotine û va ye em ji dibêjin û xuya ye ku zarokên me ji dê bibêjin. Her rast e; her derbas dibe; her temiyekî/şiretekî dike; her tê zimên: di nav gel de belav e û naveroka xwe bi hevokkek ji sê peyvikan diparêze.

Yeka din:

Çelekê didoşe Fatê, to di-din Xatê.

Heta ku di civatê de şêlandin (kedxwarin) hebe, ev her rastiekê tîne zimên.

BICİHBÛNA GOTİNÊ PÊŞİYAN

Gelo gotineke pêşîyan çawa dikane bi sedsalan, bi hezarsalan jîndar bimîne? Ew şîret û ew rastiya gelempere, çawa dikane bi gotineke kurt, bi hevokkekê were zimên? Civat ewqas diguhere, dikeve, radibe, têk dice, bi ser dikeve, xwe nû dike, dîsa ji metelok di civatê de her miteber dimînin.

Li vir mirov dikane tişteki bibêje; bêguman her metelok di her pêvajoya civatê de derbas nabin, ango rastiyeke gelempere nabêjin. Lewra mirov dikane li vir metelokan bi du beşan parve bibe:

a) Metelokên ku tenê rastiya pêvajoyeke civatê, tînin zimên. Wek ku tê zanîn, civat di hin pêvajoy de carinan ji bin de tê guhertin. Ji ber ku ev guhertin bingehîn e, rabûn û rûniştin, orf û adet, têkili (pêwêndî), berkêsan, avakarî.. hwd. Gîş bi tundî diguherin. Lewre di van pêvajoyan de, gelek rastiyen berê ji dikevin nav rûpelên diroka civatê. Ji tunebûnê bi rengên xwe yên kevin edî derbas nabin. Bi vê re, ev tevre metelok ji, ji bo civata nûjen edî rastiyekî gelempere nahînin zimên. Lê dîsa ji ew pirr hêja ne, dewlemendîyeke civatê ne û pirr bi kér in. Ji ber ku ji diroka civatê ronî dîkin û mirov dikane bi saya wan gelek taybetmendîyen pêvajoyen civatê yên kevin bizanibe. Anglo tevi ku edî rastiyekî ye û civata nûjen nahîne zimên ji, dîsa ji bi kérî civatê tê. Ji bo pevgihandina paşeroy û pêşerojê dibe alîkar. Mirov

dikare ji bo vê beşa metelokan çend mînakân bide.

METELOK Û RASTIYA CIVAKÊ

Bûk li hespê ye, hefsar li mistê ye, kes nizane qis-metê kêt ye

Ev metelok rastiyeke civatê tîne zimên. Dixwaze du tiştan bibêje: yek jê ew e ku, keç di zewaca xwe de ne xwedîdeng in. Anglo ewê bi kêt re bezewicin, herin têkevin nav malbata kêt ji wan, ne diyar e. Mezin ji xwestiyan kê bixwazin, ew dê di nav malbata wan kevin û bibin qismetê kurê wan. A din ji der heqê rasthatîniyên di tekiliyên civakî de ye. Di-be ku ji berdela xwînê bibe qis-metê dijminekî, an ji bi yekî re bizewice, lê ew zû bimire yan bê kuştin û icar li gorî adetan bi bî-rayê wî re bizewice. Mirov dikane bibêje ku ev metelok pirrtir di pêvajoya feodalî û yêne kevnîr de derbas dibe. Her ku civat bi pêş bikeve, nûjen bibe, bi wê re, ewê ji aliyeke ve ji qismetbawerkirin kêm bibe û ji aliye din ve ji, kec wê di pêşeroja xwe de pirrtir xwedîdeng bin. Ev metelok ji dê paralel vê guhertinê, her ku here kêmter were bikaranîn. Lê ewê pêvajoyen civakî yên kevin ronî bibe.

Mala zavê def û zurne, mala bûkê hay jê tune

Bêguman, her ku civat nûjen di-be, mala bûkê ji bi zewaca keça xwe şâ dibin. Lê ev metelok dê dîsa ji taybetiyen zewacê kevin bîne zimên.

Ji eslan bipirsin, ji bedsa-lan bitirsin

Ev metelok ji wî pirrtir di pêvajoyen civakî yên ku esilzadeti lê xurt e de, derbas dibe.

b) Beşê duduyan ji metelokên unîversal pêk tê. Anglo ev tevre metelok her û her rastiya xwe ya gelempere diparêzin. Di her pêvajoya civakî de şiretekê dîkin. Em ji wan ji çend mînakân bidin:

Kurmê darê ji darê ye

Ango pirsgirêk û kemasîyên hundîrin sedema têkçûnê û asten-qa serketinê ne. Gava ku mirov li civaka me dînihêre, mirov dibîne ku ev metelok ji kevin ve, rastiyeke me yê gelempere tîne zimên. Kirinê gundparêzan, şerê bira-kuşiyê yên dawîn li Başûr vê rastiyê baş datfîne ber çavêne me.

Te çî danî beroşê, tu dê wê bixwî.

Pîvazan nexwe, bêhn ji te nayê.

Ne Konê bêpez, ne gundê bêrez, ne mirovê ku dibêje ez û ez.

Bipirse, netirse.

It takes two to make a quarrel. (Metelokekî ingilizan e. Wateya wê: Ji bo pevçûneke du mirov pêwist e. Anglo hin kar du mirovan divê. Bi Kurdi hin metelokan wek ve: **Yek Yek e, du-du komek e. Bi gulekî bi-har nayê û hwd.**)

Wek ku tê dîtin, mesajen ku tînin zimên bi ne pevajoyeke civakeke taybetî, lê bi hin rastiyen u-niverşalî (kayînatî) ve girêdayî ne.

Li vir ez dixwazim taybetiyekê

metelokên Kurdi bînim zimên. Ew muzîkal û melodîk in. Her tim li ser ahengeke dengan têne avekirin. Ez difikirim ku ev taybetiya metelokên me ji sedemeke jibîn-nebûna wan e. Lewre tiştên bi ritm û melodîk pirrtir di bîra mirrov de dimînin:

Guhan jêkî Kêmo ye, teriyê jêkî Quto ye, kûçikê hero he-ro ye.

Min li metelokên çend zimana kola, di tu yekî de ev reng ritm a-henga dengan tune bû.

Kurdî di warê metelokan de pirr dewlemend e. Mirov dikane bibêje ku bi hezaran, heta bi deh hezaran metelokên Kurdi hene. **Or-dixanê Celil û Celilê Celil** di beşekî pirtûka xwe ya bi navê "Zargotina Kurdan" de, ji derdora Kurden li Ermenistanê hin metelok civandine, hejmara wan li dor hezari ye. İcar ku du kes li herêmeke ku hejmara Kurdan bi sed hezaran e, ewqas metelok bîcîvîn, gelo li Kurdistanâ ku bi milyonan Kurd lê dijîn çiqas metelok hene?

Pir mîxabin metelokên me ji wek bi tevayı çanda me, ji inkarkirin, qedexekirin û talankirina dagirkiran para xwe girtine, xesar dîtine. İcar mirov ji ku derê xesarê vegere ew kar e. Divê em li wan xwedi derkevin, bîcîvîn, binivîsinin û çap bikin. Wek gava pêşin, kî ci metelokan dizane, divê li derekê binivîse û ger fersendên wan ên lêkolînê kûr û çapkirinê tune be, ji dezgehên Kurdan re bişne. Ez bawer dîkim ku di çend mehan de wê bi hezaran kom bibin.

DEWLEMENDIYA ÇANDA KURDAN

Pêşîyen me gelek bir û bawerî. ditin. hwd. ên xwe di metelokan de bi gewde kirine. Ev ji hêlekê ve dewlemendîye çanda me ne, ji hêla din ve ji li ser diroka civata me agahdariyên giranbûha di-hundiñin. Hema tu bibêji li ser her rastiyeke gelempere, ji bo her şîret an temiyekê metelokek afîrandin e. Gelek ji şîret: temîrî-a-gahdariyên wan niha ji ronahiyê didin me. Her ku mirov rewşekê dibîne, metelokeke Kurdi tê bîra mirov. Min çend rojname berçav kirin. Min xwest, ez bibînim ku ci nûce, ci metelokan tîne bîra min û ku metelokên me di jiyana me ya iro de çiqas miteber in. Çend mînak li jér in:

Dewlet dibêje ku, li Kurdistanê li dora 150.000 leşker 30.000 gundparêz hene. İcar mirov hejmara tîmîn taybetî û polisan ji deyne ser, gelo dibe çend sed hezár. Ên me ji dibêjin li dora 10.000 gerîla hene: **Yek heye bi sedî, sed hene ne bi ye-kî.**

Hetika ISKI: **Yê ku bi ziman û doxîna xwe dizane tu ga-zin jê nabe.**

Bertîl keviran nerm dike.

Silo bû şahidê Kozakçıoğlu: **Şe-hadê rîvî dêla rîvî ye** (Şahîdî rovî dûvî rovî ye).

Kuştinê kiryar nedîyar (faîlê-mechûl): **Dîzika kevanî şike-nandî, deng jê nayê.**

Birîndar birîna xwe dizane.

Kesê ku cêran çêke dikane çembilan ji pê ve bike.

Hek malxweyê malê Silo be, wê xwarina kulfet sor çilo be.

Malxweyê me Om e, xweli li serê me kom e.

Gazinê dewletê ji komeleyen maşen mirovan: **Ê ku sîr nex-we, bêhn ji devê wî nayê.**

5 hezar kiskefen sîparîs kirin: **Mirovê ku here masiyan, qûna wan şîl dibe.**

Tîmîn Taybeti: **Di guran bir-çitir, ji maran tazitir.**

Hiko Cetin, Kamo Înan, gun-parêz û hwd.: **Gotin: "Piso tu çîma pîs î?" Got: "Xwedê li eniya min nîvisî."**

Guhan jêkî Kêmo ye, te-riyê jêkî Quto ye, kûçikê hero hero ye.

Ji xelkê re jîr e, ji xwe re kül e.

Kurmê darê ji darê ye.

Olimpiyat nedan Stenbolê, xemla Ciller pere nekir: Dizikê got: **"Binê min zêrin e"**, heskê got: **"EZ niha ji binê te derke-time".**

Serleşker her sal dibêje: "Emê vê bişarê parvexwazan biqelihîn": **Her dikane bibêje, lê her nikane bike.**

Hesabê mal û sûkê li hev dernakeve.

Heçî ne li govendê ye xweşreqas e.

Leşkeren Romê êrisi gundiyan dîkin: **Kitik ne li mal e, navê mişk Evdirehman e.**

DYP û SHP iqtîdar, ANAP û RP muxalefet: **Got: "Kûçik çêtir e, yan beraz", got: "Nalet li herduya be".**

Tîkiliyên Tirk û Cihûyan: **Kalo ji bêkesî, pîrê ji bênefîsî, herduya li halê hev pîrsî.**

Rêxistinê Kurdi ji bo eniya neteweyi gotûbêjan dîkin: **Heta hevraz nekeve ber te, qedrê berjêriyê nizanî.**

Ecevit, Cölaşan, Türkîs û hwd.: **Jar ji çeliya maran xelas nabe.**

"Terörîst alçaklar!" (Manşeta Hürriyetê): **Guriyo, navê min li te, kumê min li serê te.**

Serrawestina yekali bêbersiv ma: **Xencer bîra ye, tiving pîsmam e.**

Cenazeyê Özal: **Bavê xwe kuştîye, bi gora wî sond dixwe.**

Tirkiye welatekî demokratik e: **Jûji ji téjikê xwe dinêri û digot: "EZ bi qurbana pûr-tika xwe ya hevrişim bîm".**

Cavkaniyên metelokan: Dersen Kurdi, Baran Rizgar, London-1993; Proverbs et Enigmes Kurdes, R. Lescot, Paris-1937; Zargotina Kurda, Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Mos-qo-1978

Têbinî: Min dil heye ku ez lêkolînê xwe yên li ser metelokan Kurdan pêşdetir bixim. Ji bo hevkarî û agahdariyê, ji kere-me xwe re, ji vê navnisanê re binivîsin:

45 Wilmot Close, Peckham Hill St. London SE15 6TZ. U.

Çîrokênu ku di nav gelê Kurd de têñ gotin:

Hacoyê dîn û Mihoyê biaqil

Halil Kurt

Hebû tune bû, rehma Xwedê li dê û bavê haziran bû.

Hebûn du birayê hev, bavê wan û diya wan miribû, tu kesê wan tune bû. Çelekeke wan hebû. Ji herdu bira jî yek jê dîn bû, yek jî bi aqil bû. Navê birayê dîn Haco bû û navê birayê bi aqil jî Miho bû. Herdu bira bi dorê dicûn li ber çeleka xwe ku bicêrînin. Rojekî Haco çeleka xwe bir çolê nêri ku, gumgumokê li serê tehtekî sekiniye û serê xwe bilind kiriye û berê xwe daye jor, Haco got: "Wa xaltîka gumgumokê!" Gumgumokê serê xwe hejand, Haco got: "Wile dibê hê." Dîsa bang kir got: "Wa xaltîka gumgumokê bila çavê te li çeleka min be ezê herim malê". Gumgumokê dîsa serê xwe hejand. Haco dibêje: "Wa ye min çelek hişt û ez cûm, bi xatirê te. Bila gur çeleka min nekujin" û Haco çelek li çolê hişt û hat malê.

XALTÎKA GUMGUMOK

Gava ku Haco giha malê, Miho got: "Kanî çeleka te."

Haco: "Min çelek li cem xaltîka xwe ya gumgumokê hiştîye û min jê re got, çavê te lê be. Wê jî got, "Bila". Miho got: "Tişt bi çelekê bê ez zanim bê ci bikim ji gumgumokê." Bû sibeh, Haco berê xwe da çolê û hat cihê ku çelek lê hiştibû. Gava ku giha ba çelekê nêriña ku nêri got: "Guran çelek kuştîye." Haco pirr qeherî û hêrs bû li dora xwe nêri ku gumgumok dîsa li ser serê tehteyê got: "Wa xaltîka gumgumokê, ma min ji te re negot çavê te li çeleka min be." Gumgumokê zimanê xwe derxist û tif kir. Haco got: "Wek te çelek daye guran, di ser de tif jî dike." Rahîst darikî: "Ez hatim te" û çû gumgumokê, nêzîkî gumgumokê bû, gumgumok ket qelşâ tehteyê, Haco darê xwe di qelşâ tehtê da rakir ku gumgumokê bikuje nêriña ku nêri bû xuş xuşa zêra ji qelşâ tehtê hatin xwar. Kêfa Haco hat û got: "Ez bi qurbana xaltîka xwe ya gumgumokê bim zêr ji min re şandin."

ZÊRÊN GUMGUMOKÊ

Hat malê xurcika xwe anî

û tije zêr kir û végeriya malê, birayê wî yê Miho got: "Ew ci ne?" Haco got: "Zêr in, guran çeleka me kuştibû xaltilka min gumgumokê mafê wê da min." Kêfa Miho jî pirr hat û xwe avêt Haco maçî kir got: "Ez bi qurbana birayê xwe bim ku çeleka me li çolê hişt." Û kêfa herdu bira li wayê, bi hev şewirîn û querarê xwe dan gotin: "Emê ji vî gundi derkevin." Tiştê wan tune bû ji xeynî xurcika zêran û tûrekî wan i nêñ. Xwe hazir kirin ku bi rê bikevin, Miho şeytanî kir ji Haco re got: "Bira xurcika zêra ji min re û tûrê nêñ jî, ji te re." Haco jî got: "Bila." Û herdu bira rahiştin malê xwe û bi rê ketin. Qederê sê-çar saetan meşîyan li çolê Miho got: "Bira ez birçi bûm, ka parçeyek nan bide min." Haco got: "Tu nîvê zêr bide min, ez jî parçeyek nan bide dim te." Miho got: "Na." Haco jî nan nedayê. Hineki din ji meşîyan, Miho nêri ku nikare bimeşe ji bircibûnê, tali got: "Bavo nîvê zêr ji te re ka parçeyek nan." Haco rabû parçeyek nan dayê û nîvê zêran bûn yê Haco.

JI BO PARÇEYEK NAN

Qedereke din jî meşîyan Miho dîsa birçi bû, dîsa got: "Birayê Haco ka parçeyek nan." Haco got: "Tu zérê mayî jî hemû bide min ezê nan bidim te!" Miho got: "Bira zêr hemû jî yê te bin" û zêr hemû bûn yê Haco. Haco parçeyek nan dayê.

Herdu bira gihan gundekî, çûn mala pîrekê. Pîrê ji wan re got: "Ma hûn nabin şivanî min?" Herdu bira qerârê xwe dan gotin, belê û bûn şivanî pîrê. Rojekê diçin ber pez ew û şivanekî xerîb radi bin hev û pezê wî şivanî jê distîn û ji tirsa pîrê re êvarê dereng têñ malê. Pez dajon hevşê û têñ hundir. Pezê xerîb jî ku dikeve nav hev pirr dikin barebar. Pîrê dibêje: "Çima işev pezê me dike barebar?" Haco got: "Çend pezê cîranan ketine nav pezên me, xerîbiyê dikin." Pîrê nema dengê xwe kir.

Herdu bira ji tirsa ji hevdu re gotin emê birevin berî ku pîrê bi me bihesê. Nîvê şevê bi dizika rabûn ji malê derketin û hebekî meşîyan, Haco got: "Bila." Hêkê ku ji pîrê



got: "Bira hêkê pîrê hene ezê herim bînim." Miho got: "Na, kuro na wê pîrê bi me bihise." Haco guhê xwe nedayê û çû hêkê pîrê dizîn û hat giha Miho û meşîyan. Çûn û çûn li mala hûtekî rast hatin. Hût ji wan re got: "Ma hûn li ba min naşixulin?" Wan jî got: "Bila."

NÊCÎRA HÛT Û MIHO

Bi ro Hût û Miho diçin nêcîrê. Haco jî sê zarokê Hût hene li ber zarokan dimêne. Rojekî hût û Miho diçin nêcîrê. Ji Haco re dibêjin: "Çavê te li deriyê malê be, tişt bi malê neyê." Haco jî radibe dibêje; "Ezê serê zarokan bişom," sîtilek av datîne ser agir dikelîne û her sê zarokê Hût di nav ava kelândî de dadike. Çermê laşê zarokan li serê wan digere û zarok dimirin.

Haco dibêje; "Min serê zarokan şuşt xewa wan hat, ketin xewê". Radibe, nîvîna ji zarokan re datîne û her sê zarokên mirî dike nav nîvîne û lihîfê bi ser zarokan de dadike û dibêje; têra xwe razin.

Miho berî hût ji nêcîrê tê malê ji Haco re dibêje: "Kanî zarok, pejna wan nayê." Haco dibêje min serê zarokan şuştîye ketine xewê di nav nîvîne de nin." Miho dere li zarokan dinêre ku her sê zarok mirine. Miho tê dibêje: "Haco te zarokên Hût kuştîne, rabe emê bazdin berî ku hût bê, wê me bikuje." Haco got: "Bila." Hêkê ku ji pîrê

dizibûn kirin tûrê xwe û de riye hût jî, ji ber kir rahiştine. Miho got: "Haco tu çîma derî tîni?" Haco got: "Ma ne hût gotibû çavê te li derî be, ez jî tînim." Herdu bira qederekî meşîyan, Hût jî tê malê ku her sê zarokê wî mirine û deriyê wanê zêr ji bîrine. Hût rabû bi dû wan ket û meşîya nêzîkiya li wan kir, Hût radihije kevira di nav destê xwe de diperçiqîne dike ax û dibêje: "Lo lo ji vir û kur de ezê we bi parça parça bikim." Haco jî hêkan ji tûrê xwe derdixîne û diperçiqîne dibêje: "Tu keviran dikî ax ez kevira dikim av û hêkan di perçiqîne, av ji hêka rêz di be." Hût dibêje; "Bi navê Xwedê ez bi van nikarim," Dev ji wan diqere û xwe vedigere malê.

SAHÎ SAHÎ BARAN DIBARE

Miho û Haco jî bi riya xwe dimeşin têne ser kaniyekî, li ser devê kaniyê darik guwîjan heye. Herdu bira derdikevin diçin ser darê û xwe vedişerin. Pişti qederekî li ser darê man, nêriña ku şivanek hat pezê xwe anî li ser kaniyê av da û pezê xwe li bin darê mexel xist. Şivan û pîra diya xwe bûn. Şivan rabû mîhek şerjêkir û pîrê tifkek çêkir goşte xwe avêtin ser agir Miho û Haco jî li ser darê ne. Haco got: "Bira mîza min tê ezê mîz bikim." Miho got: "Bise kuro bise xwe bigire." Haco xwe ne-

girt û rabû mîz kir. Şivan û pîrê goşte xwe dibirêjin nêriña ku nêri : "Ji jor de peşkê avê bi ser wan tê xwar. Ji hev re gotin: "Sayî sayî baran dibare." Kêliyek din dîsa Haco got: "Bira bi Xwedê gûyên min jî tê" Miho got: "Bise malixerab kesen ku li bin darê ne wê me bibînin." Haco lê guhdarî nekir rabû gû jî kir. Ên li bin darê gotin: "Sayî sayî sepe lor barî" û zorê didin goşte xwe dikelînin. Dîsa Haco got: "Destê min qerimîn, ezê derî berdim." Miho got: "Bise malixerab wê bi me bi hesin." Haco rabû derî jî, ji destê xwe berda û bû şinge şinga derî, şivan got: "Ezman ket." Pezê xwe hişt û baz da. Pîrê ji rahiştîye tevşokî dibêje: "Yê ku nêzîkî mîrga (xwarin) min bibe ezê wan parça parça bikim." Miho ji Haco re got: "Çîma te derî berda?" û herdu bira rabûn hev. Hevdû birin û anîn. Haco got: "Wile ez zora vî nikarim bibim." Di xwe de fikirî ku wî bavêje ber tevşoyê pîrê. Pîrê rabû bi tevşoya belîşî Miho kir parça parça û Miho kuşt. Haco ma tenê û gelekî jî birçi bûye got: "Bi xwedê ezê vê pîrê bikujim û xwarina wê bi xwe ve bihêlim. Haco rabû li dora pîrê xwe ji aliyeke ve avêt ser pîrê û tevşo ji destê pîrê derxist û belîşî pîrê. Bi tevşo pîrê hûr kir û kuşt. Xwarina pîrê û keriyê pez hemû çik ji Haco re man û Haco ket ji yaneke nû.

Di 7 saliya damezirîna YJWK'ê de

'Jina Kurd hilberîna rêexistiniyê distîne'

Selîm Biçûk

Jina Kurd di heftsalîya damezirandina YJWK yê de ye û alîkarên şoreşa Kurdistanê ye. Xwedî berpirsiyar û hêza bingehîn e ji bo şoresê

Îro gelê Kurdistanê bi hemû hêza xwe ve serî hildaye. Li hember zîlm û zorê, şerê hebûn û mayînê dike. Desten xwe ber bi rojê ve bilind dike. Tirêjan ber bi xwe ve dikişne. Ji bo serxwebûn û azadiya xwe, ji bo mirovahîya xwe, bi hemû besen xwe ve, can û malê xwe bi gorî hatina xwe dike. Ji hêla din ve ji, ji bo ku dijmin xwe ji astengî û aloziyên xwe rizgar bike, bi êrîşen hovane û bi şerekî qirêji li hember vê raperînê radiweste. Gund û bajaran bi erdê re dike yek. Malan dişewitîne. Zarok, kal, jin û xorten bêguneh dikuje. Bi kurtahî: zagona mirina reş bê dilovanî li ser gelê Kurdistanê dimeşîne. Li derî Kurdistanê ji êdi gelê me yê serhîlî bersiva dijmin dide û bêdeng namîne. Li hember qirkirîn hovane berxwedanê bilind dike. Û di her hêlê de xwe bi rêexistin dike.

Di nava beş û qatên civaka Kurdistanê de, jina Kurd nîvê vê civakê ye. Nîvîku bê rizgariya wî, civak tev bindest dimine. Jina Kurd mîna beşekî ji civaka Kurdistanê, di nava Yekîtiya Jinê Welatparêzê Kurdistanê (YJWK) de xwe bi rêexistin kirîye. YJWK di sala 1987'an de hatiye damezirandin. Di van deman de şes sal xebat ji jiyana xwe derbas kir û kete salala heftan. Ji bo bîranîna damezirandina YJWK'ê, li tevahiya welat û bajaren Ewrûpayê şev û şahî li dar dikevin. Bi hezaran jinê Welatparêz ku bi hezaren kilometran ji welatê xwe dûr in. Tevî van şadîmaniyan dibin. Ji bo serxwebûn û azadiya xwe dengê xwe bilind dîkin. Çavên girtî bi ronahiya şoreşê vediñin.

Bi mebesta agahkirina rojnameya Welat, em di mîjuya 13.11.1993'yan de li bajarê Hannovera Almanyayê besdarî şeveke YJWK'ê bûn û li beşekî ji xebat û têkoşîna jina Kurd agahdar bûn.

LI ŞÛNA JINA KOLE LI KURDISTANÊ JINA AZAD ÇEBÛYE

Di axaftina siyasi de, hevala Xanê bi firehî li ser rewşa şoreşa Kurdistanê, rewşa jina Kurd û rola wê di şoreşê de rawestiya. Xanê, wiha digot: "... Jin bû gerîla. Ji bo şeref û namûsê rahişt çek û rest pêça. Mîr ji ber wê rabû... Jina Kurd rûmeta xwe bi destê xwe çekir... Çarenûsa (qeder) jina Kurd û Kurdistanê girêdayî hev û din e. Bêyî serxwebûn û azadiya welat, rizgariya jinê ji nîn e. Jina Kurd ne alîkar, lê xwedî berpirsiyar û hêza bingehîn e ji bo şoreşa Kurdistanê... Dayîkên me nezan bûn. Tiştek ji bo me nekirin. Lî îro, di nava evqas ronahî de, dayîk kor bîmînî nabe. Kesek ji dayikên kole û çavgirtî hez nake... Li şûna jina kole, îro li Kurdistanê jina azad çebûye..." Her wiha hevala Xanê bi van gotinan axaftina xwe dawî kir: "Jina Kurd çiqas şer bike, ewqas azad dibe. Çiqas azad bibe, ewqas cihê wê di nava civakê de çêdibe. Çiqas cihê xwe di nava civakê de çêbîke, ewqas hatina xwe bi destê xwe çedîke."

Di nava şevê de, me çend pirs ji hevala Xanê kirin. Wê ji wiha bersivan din:

Kengî û çîma YJWK hat avakirin?

- Yekîtiya Jinê Welatparêzê Kurdistanê, di sala 1987'an de li Ewrûpayê hate damezirandin. Ji bo birêvebirina kar û xebatê tevgera rizgariya neteweyî ya gelê Kurdistanê, ERNK hatîbû damezirandin. ERNK ji bo ku dibin ala xwe de hemû qat û besen gelê Kurd kom bike û cihê her yekî belî bîke, ji bo her rîz û qatan yekîtî hatin avêtîn. Heta doh, jina Kurd ji xwe bêhaydar bû, xebera xwe ji xwe nîn bû. Nîzanibû jîn ci ye, rewşa jîn ci ye? Azadî ci ye? Hatin bi ci rengî çedîbe. Di ser de ji dihat perçiqandin. Ne xwedîtu mafî bû. Ji bili vê ji haya wê ji wê nîn bû. Bi damezirandina YJWK'ê re, jin bi xwe hesiya. Xwe nas kir. Ji bo hatina xwe gelek kar û xebat da meşandin. Ew jina ku nikaribû du gotinan bîne ser hev û din, dibin Yekîtiya Jinê Welatparêzê Kurdistanê (YJWK) de îro ji bo hatina xwe bi hemû rengî kar û xebatê dike. Büye hêz û qewetek mezin.

Jina Kurd di nav têkoşînê de hem bi mejiyê xwe hem jî bi jiyana xwe ber bi azadiyê ve dimeşê, ew çiqas şer dike ewqas azad jî dibe.

tanê de ku bi damezirandina YJWK'ê pêşîya jinê Kurd hatiye vekirin. Alikarî bi wan re hatiye kirin. Ji bo hatina xwe kar û xebatê didin meşandin. Ji dema ku YJWK hatiye damezirandin û heta niha gelek pêşveçûnên mezin hatine a-firandin û gavên pêşveçûyî hatine avêtîn. Heta doh, jina Kurd ji xwe bêhaydar bû, xebera xwe ji xwe nîn bû. Nîzanibû jîn ci ye, rewşa jîn ci ye? Azadî ci ye? Hatin bi ci rengî çedîbe. Di ser de ji dihat perçiqandin. Ne xwedîtu mafî bû. Ji bili vê ji haya wê ji wê nîn bû. Bi damezirandina YJWK'ê re, jin bi xwe hesiya. Xwe nas kir. Ji bo hatina xwe gelek kar û xebat da meşandin. Ew jina ku nikaribû du gotinan bîne ser hev û din, dibin Yekîtiya Jinê Welatparêzê Kurdistanê (YJWK) de îro ji bo hatina xwe bi hemû rengî kar û xebatê dike. Büye hêz û qewetek mezin.

Ew jina bêhay, bêdeng û bêziman di van şes salen derbasbûyîn de YJWK'ê ew ji ku gihad ku?

- Bi rastî jina Kurd tu caran çarenûsa xwe bi ya welatê xwe re nedidit. Tu caran rizgariya xwe bi rizgarkirina welat re nedidit. Tiştekî gelekî mezin e ku îro jina Kurd bi hezaran kilometir dûrî xaka xwe bi welat bihizire. Tiştekî dîrokî ye. Berî damezirandina YJWK'ê ev tişt nîn bû. Îro jina Kurd ji bo welatê xwe dikare bihizire. Hezkirina ax, gel û welat di dilê xwe de civândiye. Ji bo vê dihizire û kar û xebatê dike. Bi sedan keçen Kurd jiyana xwe ya kesanî dane rawestandin û xwe bi gorî welatê xwe kirine û dîkin. Ên ku ji vir dane rî û berê xwe dane Kurdistanê cihê xwe di nav şerê germ de girtine. Û li ser axa welat kar û xebatê bi rî ve dibin. Ên ku li Ewrûpayê bi tevahî xwe dane têkoşînê. Û di nav de roleke (risteke) mezin dilizîn. Dîsa girêdayî YJWK'ê li her bajarê Ewrûpayê komên jinan hene, di nava xwe de xebatê bi plan û program dîkin û têdikoşin. Serî li malbatan dîdin. Heta doh jina Kurd nikaribû here mala cîranê xwe. Lî îro dikare sîh-cil malî ziynet bike. Dikare li bajaran bigere, bi serê xwe cîvanan çêbîke. Li ser çarenûsa (qeder) a xwe deng bike. Pere-



yan di nava xwe de ji bo alikariya welaîte xwe kom dike. Kovara "Jina Serbilind" ku weşana YJWK'ê ye derdixe, belav dike, dixwîne û dinivîsîne. Zarakîn xwe ji bo hatinê (pêşerojê) amade dike. Bi giyana welata mezin dike. Ev tişten li ber çavan in û gelek mezin in. Lî tevî vê ji tişten ku YJWK'ê heta niha kirine û dîkin ne bes in û li gorî xwestekîn demê pîr kêm in. Em dixwazin hemû jinê Kurd di nava yekîtiya wan de kom bikin. Zane bikin. Pêwist e jina Kurd di politikê de ho (hîn) bibe û xwe nas bike. Dema ku xwe nas bike wê ji sedî sed pê bihese ka ci jê re divê. Hingê ji li gorî vê pêdiviyê wê têbikoşê.

Hevala Xanê dixwazî tiştekî din ji bo xwendevanên Welat û jina Kurd bîbêjî?

- Ez dixwazim bibêjim, yê ku di dema derbasbûyî û di dîroka bindestiyede, ês û jana herî giran kişandî jina Kurd bi xwe ye. Yê ku îro ji di nava şerê qirêji de êsekê dîkişîne jina Kurd e. Baweriya me ew e ku heta Kurdistan serbixwe û azad nebe, jina Kurd ji serbixwe û azad nabe. Ës û derdîn wê xelas nabin. Xwestekîn wê bi cih nayê.

Di ve derna ku dijmin bi êrîşen dijwar û hovane bi ser gelê Kurdistanê ve tê, pêwist e em van şes salen derbasbûyîn baş binirxînin. Kar û xebatê xwe dibin çavan re derbas bikin. Ji bo pêşerojê delametên jina Kurd berçav bikin û lê xwedî derkevin. Jixwe ev ji armanca şeva me ye. Li ser vê armancê ez bang dikim hemû jinê Kurd li ser xaka welat û li derveyî welat, em di nava şoreşê de cihê xwe bigirin. Ên di nava şer de, ên di nava karê politikî de. Di her hêlê de em xwe pêş bixin. Em YJWK'ê xurt bikin. Li cihê kar, di dibistanan de, di malan de. Li her cih jinan di nava yekîtiya wan de kom bikin. Wan zane û hisyar bikin. Û bi vî rengî em alîkariyê bidin şoresê. Em ji bo şoreşa Kurdistanê hêza bingehîn in. Banga min ji bo hemû jinan ev e ku, em li şoreşê xwedî derkevin. Şoreşa Kurdistanê azadiya jina Kurd e.

Di dawiyê de, em rojnameya Welat spas dîkin û serkevtin jê re dixwazin.

Bang ji bo Meşa Azadiyê

Rûmeta mirovahîyê ya ku gelê Kurd bi berxwdana xwe ya bêrawestîn diparêze, li dijî mîtingehkariya dewleta Tîrk û artêşa wê ya hov ên ku bi sedsalan e mirovîn Kurd dîkin kole û kesitiya wan didin bin piyan, wê bi ser keve.

Bi vê bîr û baweriyê em bang li hemû rewşenbîran dîkin ku besdarî Meşa Azadiyê ya YRWK (Yekîtiya Rewşenbîrîn Welatparêz ên Kurdistanê) ê bibin ku ji Parlementoya Almanyayê heta Parlementoya Ewrûpayê ango Ji Bonnê heta Brûkselê ye.

-Komîteya Meşa Azadiyê-

* Mes wê di 23'yê Kanûnê de li ber Parlementoya Bonnê dest pê bike û di 4'ê Çileya 1993'yan de dê li Brûkselê li ber Parlementoya Ewrûpayê biqede. Kesên dixwazîn besdarî Meşebibin, karin serî li vê navnîşanê bidin: YRWK, Maxstir. 50-52 53117 Bonn.

Gula Kurdistanê li Stenbolê stûxwar e...

M. Zahir Kayan

Bala xwe didimê
Gul e
Destê xwe diavêjimê
Pûç e
Dipirsim
Ev çi gul e?
Guleke biyan e dibêjin bi tinaz
Ji ku derê qetandine?
Dibêjin
Ji Kurdistan, murdistan...
Qe xwediyê wê tun e?
Bi ken "heye" dibêjin
Wa Mafya Keko
Jinfiros Misto
Diz û mizên li, der û dor...
Dibêjin ma tu çîma dikenî?
Dibêje:
"Gula Kurdistanê li Stenbolê stûxwar e
ji bo wê..."

Dizivirim,
Dicim, li pey xwe mêze dikim
Gula min stûxwar e
Kelegirî dibim
Dikim biqetînim biavêjime deryayê
Derya dibêje:
"Meqetîne"
Dibêjin:
"Dixwazim gula xwe bişom
Wek ava Kurdistanê zelal û delal bikim"
Ew dibêje:
"Bi ava min gula te paqîj nabe
Qirêj bi qirêjê paqîj nabe
Gula te bêyî Kurdistan maye
Pêlên deryayê serxweş in
Bi şûşeyen araqê ve yek bi dil
Serxweş bûye"
Em li hev mêze dikin
Ew bi min dikene
Dibêje:
"Çendî çend kes hatin li ber lêvîn min
sekinîn wek te

Ereb hatin, Tirk hatin, Rûm hatin, Kurd hatin
Lê min tu kesî weke Kurdan bi xem û kul
neditin

Awir û nêrînê wan pêlên min diwestîne
Lê wek wan min tu stûxwar û belengaz

nedîne

Gelek av û gelek hêşir tevî min bûne
Lê ji hêşîrîn Kurdan min birîndartir tu hêşir

nedîne

Carinan bi wan re diqîrim

Carinan dibim gula dilê wan, pêlên xwe wek
Gorana Hozanêni Kurd dimeşînim
Ew rûdinin diponijin
Ez wek sewta bayê Kurdistanê li der û
dorê wan bayê xwe digerînim
Ew digirîn ez aş dikim wek dayîkên
Kurdistanê...."

"Wisa sar mame
Li deryayê mêze dikim
Dixwazim pirr tiştan bibêjim
Lê çol û mift li dev û lêvê min ketine
Belê ji gotinêni te fêm dikim
Ey derya li me guhdar
Tu der me wek te aş nake
Ne Beyoğlu, ne Kumkapı, ne Lunapark....
Li her derê vî bajarı xwe biyan dibînim
Kesî dilovan tun e
Direvime ba te
Wek hembêza dayîka xwe
Wek çem û kaniyê Kurdistanê
Xwe diavêjime hembêza te
Her bi te re dikarim biaxfim
Her tu dipeyivî bi peyvîn zimanê gelên

bindest

Yek te dibînim ku nehatiye guhertin
Li hember min dost û dildar
Lê tu ji birîndar i
Te ji wek min ken ji bîrkiri ye
Da gula me herdukan ji
Li Stenbolê stûxwar e..."
Wê demê
Dêrekinek derbas dibe
Çend serserî merserî li pey ketine
Dêrekin dimilmile
Ba li dêreyen kinik dixe bi jêr ve hiltîne
De xort in...
Ba li dilê wan dikeve
Dikenin dîlan dikin
Ez û derya em li wan mêze dikin
Li ciheke din
Keç û xortekî hev du hembêz kirine
Ha l'vî alî ha l'vî alî
Bi kesereke mezin hevdu maçî dikin
Ez xizanê Xwedê
Li ber devê deryayê sekinîme
Qetbirr û hovîtiyên li Kurdistanê difikirim
Dengê bombe û tifingan
Di mejiyê min de wek derba bizmaran birîn
çekirine
Dema min xatirê xwe ji deryayê xwest
Sê çar dêrekinan xwe avêtibûne hembêza
deryayê
Derya yek bi dil dikeniya
Lê ez ji wir dûrketim bi dilekî sar û xemgîn....

Çiyayê bilind

Ji min pirsîn û gotin Jan!
Li Kurdistan
Çiyayê pirr bilind kîjan?
Gelo Hemîn e an Sîpan?
Erarat pirr bilind e yan
Çiyayê Kurdan yê Berzan?

Min bersiv da
Min got: "Xurt in çiyayê me
Bilind in tev
Belê yêni pirr bilind û xurt
Ew in pêşmergeyên Kurdistan."

Jan Dost

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Lêlê û lolo

A Imanya dixwaze di bazara Rojhilata Navîn de karêni xwe yên aborî zêde bike û bi Amerikayê re hemberiyê bike. Ew dizane ku KT ji, ji vî karî re di rewşa xwe ya îro de ji her tawîzî re amade û bi la-ve lav e. Zeyneba Zer (Tansu Çiller) ji hem ji aliye madî, manewî, fizikî, rûhî ve û hem ji bi rîzanî ji bo hemû ta-wîz û dayinan hazir e. Bi kîrhatî û musâid e. Der barê PKK'ê de ki ci jê bixwaze ji dayinê re amade ye.

Almanyayê jê re gotiye, ezê wiha bikim, lê divê tu ji wiha bikî. Zeyneb û KT'ê ji gotine, belê ser çavan û ser seran, ser sîng û beran. Lê belê gotineke pêsiyan heye: "Ev lêlê ye, hê lolo ji maye". Zeyneba Zer bi tenê li lêlê difikire, lê Ewrûpa li lêlê û lolo bi hev re difikire, dixwaze Tirkîye jê re rîberîtiya aborîyê bike. Ji Zeyneba Zer û KT'ê ci tê bila wan bixwazin û bistînin heta ku dema lolo ji hat. Ji ber ku ew rind dizanin lêlê bêyî lolo nabe. Bazar û kara Rojhilata Navîn bê aştî û sikûnet nameşe, ew ji girêdahiyê meseleya Kurdistan, Filistîn, Qibrîs û Qafqasyayê ye. Bi taybetî ji meseleya Kurdistanê ye. Ewrûpa ji, Amerîka ji, hemû dinya ji rind fêm dikin û diza-nin ku hereketa PKK'ê serhildana gelê Kurd e. PKK'ê rîberîtiya wê ser-hildanê kiriye, dike û dê bike ji.

Ji Zeyneba Zer û KT'ê ci tê bila wan bixwazin û bistînin heta ku dema lolo ji hat. Ji ber ku ew rind dizanin lêlê bêyî lolo nabe. Bazar û kara Rojhilata Navîn bê aştî û sikûnet nameşe, ew ji girêdahiyê meseleya Kurdistan, Filistîn, Qibrîs û Qafqasyayê ye. Bi taybetî ji meseleya Kurdistanê ye. Ewrûpa ji, Amerîka ji, hemû dinya ji rind fêm dikin û diza-nin ku hereketa PKK'ê serhildana gelê Kurd e. PKK'ê rîberîtiya wê ser-hildanê kiriye, dike û dê bike ji.

bikin. Tabî, gur û govend, faşizm û demokrasî, barbarî û yarı bi hev re nameşin. Komara Tirk û faşistîn wê yên xwînxwar dixwazin ku dîsa ji wekî her carî bi derewan a-girê doza azadiya Kurdan bitefinin û dîsa ji binka bikin, çawa ku Süleyman Axayê wan û Güreş Paşayê wan ji wilo dibêjin û wilo ji xwe dixapînîn. Lê Süleyman Axa dizane ku ne wisa ye, ev car ne ji wan caran e, lê Güreş Paşayê wan fêm nake, lewre ew hê ji bi hisê Kenan On-başiyê hevalê xwe difikire, bi mentiqâ wî dimeşe û bawer dike kû Tirkek beramberê dînyayê ye. Lewre leşker e, li hember wî ji Zeyneba Zer e. Belê Almanya, Ewrûpa, Amerîka û dinya wekî wan nafikirin, bi wan dilizîn, wan tî-nin ser fêlê û kozikê, heta ku bixin dafikê û basko bikin, wekî dîkê pot berdin meydanê. Rind dizanin ku gur heta nekevin berfê û şepayê û newestin mirov nikare nêzîkî wan bibe. Dema ku ketin berfê westîyan û kef bi devê wan ket mirov wê demê bi guhêwan digire û kapsitû dike, hisê wan wilo tê serê wan, ji çewkînê dikevin, bêzirar dibin, lê belê dîsa ji gur in.

Ji KT'ê û Zeyneba Zer re em dikarin bibêjin ku bila hisênen xwe bînîn serê xwe, bibin mirov, mafêr Kurdan ên demokratik, siyasi û çandiyê nas bikin (ne bi xêra bavê xwe bidin), çareseriya meseleyê ev e. Eger hûn bi rastî bi hev re jiyanâ gelê Tirk û Kurd dixwazin rî ev e. Şaş nebin, fehş ji nebin. Hereketa azadiya gelan bi zilm, zor û barbarî, bi imha û qetîlamê tu demê ne sekiniye, ya Kurdan ji wilo ye, nasekine. Li pey lêlêyan tim û tim lolo ye.

Azadî serfirazî bûka qelen ku xûne
Lê pirr şehîd û xazî canê xwe dan û çûne

Ev çavşorî ji xwediye xwe re zirar e

Salar Amedî

Dewletên împeryalist, bi taybeti ji yên Ewrûpayê, çiqası têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan pêşve diçe, ew çend rûyên xwe yên bi qirêj derdixin holê. Ji ber ku hemû politikayê wan li ser berjewendiyê bûrjûvaziyê têne çekirin û berjewendiyê bûrjûvaziyê ji, li ser bingehêن kedxwariyê hatiye avakirin û ji dîroka xwe ve ne mafdar in, anga neheq in û li hember mirovahiyê súcdar in, timî bi tirs in û ji xwe bisil in. Dema li ku derê gerdûnê derbe li bûrjûvaziyê li sistemên kedxwar, dagirker, paşverû û faşist dikeve, ji ber ku ew bi xwe ji bi wan jian dibin, tirsâ mirinê dikeve dilê wan. Tirsâ mirinê ji, ji bo sistemên wiha, sebeba wahşet û hovîtiyê ye. Lewma ku dewletên Ewrûpî van rojêن dawî, piştgiriya leşkerî, siyâsî û li hember hemû zilm û zordariyê bêdengmayîniya ku didan dewleta Tirk, dorfîrehtir û rûyên xwe yên rastîku tu eleqeya wî bi demokrasiyê re nîn e li nav welatên xwe ji dane xuyakirin.

Me heya niha digot qey Kurdiî tenê li Rojhilata Navîn qedexe ye. Me digot qey jîyan tenê li Kurdistanê, li Rojhilata Navîn li Kurdish hatiye qedexekirin. Ewrûpî ku li gorî xwe "navendê demokrasiyê" ne, di rastiya xwe de ji xwîna ku iro li gerdûnê tê rijandin ji bo berje-

wendiyêن wan, bi lîstikêن wan tê rijandin û destêن wan di nava vê xwînê de ye. Bi hin êrîş û lîstikêن van rojêن dawî ku li Ewrûpî li ser Kurdan têne kirin, me êdî baş fêm kir ku dewletên împeryalist li hemû gerdûnê dixwazin Kurdiyyê û jiyana ji bo Kurdan qedexe bikin. Ev ji mezinahiya têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê û mezinahiya tîrsa dilê dagirkeran dide xuyakirin.

Ev bû sê car ku dewleta Almanyayê êrîş dibe ser komele, weşanxane û navendê çandî yên Kurdan. Dewleta Swêd û Fransa ji xwe ji vî karî paşve nehiştin, êrîş birin ser komeleyen Kurdan, welatparêz binçavkirin, hin ji wan avêtin deriveyî sînorêن xwe. Tew polisên Fransa û Swêdê ew çend xwe winda kirin ku, teví ku kilit bi wan re hebûn ji, deriyêن komeleyan bi gerran şikandin. Gotin qey li "Tirkîyê" ne, êrîş birin ser malen welatparêzan ji. Ev çavşorî ji xwediye xwe re zirar e.

Dewleta Almanyayê dibêje, "Me PKK li welatê xwe qedexe kir." Qedexekirina PKK'ê qedexekirina gelê Kurd û mafen wî yên mirovahî ne. Weki din ji PKK ev bîst sal in ku bi rewsekî qedexekirî, di nav agir de, gelê Kurd ji tunebûnê, ji nû ve afirand.

Pêşveçûna civaka Kurd, iro hemû gerdûn dibîne. Se-



rok dibêje, "Berê du Kurd bihatana kêleka hev şer derdiket iro bi milyonan gelê Kurd bûne yek dilek." Ev rewş li Ewrûpî ji -ku sistema wî mirovan dixwe- bi xwepêşandan, bi meşan, bi şev û festivalan gelek caran xwe da xuyakirin. Yekîtiya me bû tirsâ mirinê ji bo dagirkeran. Ji ber vê ji dewletên Ewrûpî bi van êrîşen xwe, ji aliyekevi ve dixwazin çavên gelê Kurd bitirsînin, yekîtiya wan ku li dor xeta partiyê hatiye çekirin belav bikin, ji aliyekevi ve ji daxwaziyen dewleta Tirk pêk tînin û li hember vî tawîzen mezin ji wan distînin. Hesabênen dewleta Tirk ji ev e ku li bâkurê Kurdistanê êrîşen xwe

de hin mîratêñ bêoxir wek Şerâfettin Elçi, Necmettin Cevherî û Fehmî Işiklar amade dikin ku mîna berpirsiyaren gelê Kurd wan bidin meşandin û rolêñ bi qirêj bi wan bidine leyîstin. Ji bo van politikayen bikin jîyanê ji, ji Ewrûpî re dibêjin, "Divê hûn ji me re bibine alichî kar ku em heya bîharê PKK biqedînin."

Wan ev politika niha bi pirranî kirine jîyanê. Lî tiştekî ji bir dikin; têkoşîna rizgariya gelan, bi rêçekê rast, bi baweriyeke xurt û dîsa bi gelan dimeşe û bi ser dikive. Iro rêçekê me ya rast, baweriyeke me ya xurt heye û em -xwefiroş ne tê desih milyon in. Ne çavşoriya dijmin û hovîtiya wî û yên dewletên împeryalist û ne ji xiyaneta xwefiroşan ne mimkûn e ku ber li ber têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan bigirin. Wê mirovahî her bi ser bikeve. Emê bi ser bikevin.

Daxuyanî

Kovara me Nûdem cihê xwe guhert. Ji bo kesen eleqedar em navnîşana xwe ya nû li jî didin.

Navnîşan:

Termov. 52
175 77 Järfälla
Sweden

Telefax: 8-58356468


Kovara Nûdemê

XAÇEPIRS

Çeperast: 1-Zimanînê Kurde û li Londonê diji. Xwediye ferhenga Kurdi-İngilîz ye, di wêne de tê dîtin 2-Qebîle/ Zemîn 3-Rol/ Bêzarî/ Vexwarina bingehîn 4-Bi Tirkî 'hesp'/ Eşir/ Rêçezanî 5-Cihê ku lê genim dikin ard/ Sembola Amerik-yûmî/ Tiştîn ne sivik 6-Medenî 7-Di çanda Grekî ya kevin de yezdanê evînê/ Navê rojekê 8-Pot, pîtal/ Herdu bêdengêne pîyâ 'cîva'yê 9-Ne qalind 10-Evîna Memê/ Mane

Serejîr: 1-Li hember û pê re 2-Herikîna berfê, şepe/ Xusûsî 3-Hirî/ Birêvebirîna erebe an ji se-walên barkêş 4-Navê ordiya Sovyeta Berê 5-Sembola Neon'ê/ Kur, ewlad 6-Qenaleke televizyonê ya Almanî/ Erdê ku av diçe ser/ Cînavekeke işarkî 7-Mabest, xaye 8-Bargeha PKK'ê ya li başûrê Kurdistanê/ Navce 9-Muhîm 10-Ehd/ Agir 11-Gopal 10-Eşq

Amadekar: Rasto Zilanî



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÜYÎ

Çeperast: 1-Yura Nabiye 2-Esaret/ Moran 3-Zad/ Dok/ Mazî 4-Asiman/ SOS 5-Afret/ Wane 6-Nî/ İblîs 7-Dadaîst 8-Beg/ Ro 9-Elam/ Nîr 10-Hêz/ Rî
Serejîr: 1-Yezdan/ Beş 2-USA/ Fidel 3-Radar/ A-gah 4-Ar/ Seîd/ Mê 5-Neditbar 6-Atom/ Lion 7-Kawîs/ Îr 8-Im/ Nastûrî 9-Yom 10-Erase 11-Vazo 12-Nîsk

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneye rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînin:

Li derive: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şub No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

Li Tirkîyê: Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şub No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihê li jor vala dagirin û tevi kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bisînin.

Navnîşana Welat: Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul

Tel: 513 34 33 Fax (Tel): 511 50 07

Mercen abonetiyê:

| | |
|-----------|-----------|
| Li hundir | Li derive |
| 3 meh | 120.000 |
| 6 meh | 240.000 |
| 12 meh | 480.000 |
| | 50 DM |
| | 100 DM |
| | 200 DM |

Alfabeya Kurdî

Tîpêñ Girdek

A B C Ç D E Ê F G H I Ï J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

Tîpêñ Hûrdek

a b c ç d e ê f g h i ï j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Di zimanê Kurdî de her deng bi tîpekê tê nîşandan. Lê, di Kurdî de dengek heye ku ji du tîpan derdikeve. Anglo ew deng bi du tîpan tê nivîsandin. Ji dengê wiha yên ku ji du tîpan


derdikevin re pevdeng tê gotin. Pevdenga Kurdî ji "xw" ye. Çend mînak:

Bi xwe, serxwebûn, xwarin, vexwarin, xwişk, berxwedan, xweli, xweza...

Di alfabeja Kurdî de 31 tîp (herf) hene. Ji wan heşt ên dengdêr in. Tîpêñ dengdêr ev in:








a e ê i ï o u û

Bîst û sê tîp ji dengdar in: Ên dengdar ji ev in:

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Çend tîpêñ Kurdî

Alfabeya Kurdî û ya Tirkî gelekî nêzîkê hevdu ne. Lê, çend tîpêñ Kurdî û Tirkî ji hevdu cuda ne. An ji wek hev in, lê dengderxistina wan ne wek hev in. Ji bo xwendina van tîpêñ Kurdî, hûn li jêr çend wêne (resim) dibînin. Bi alîkariya wêneyan hûn dikarin dengêñ Kurdî rast derbixin û bixwînin.



Destpêka şanoya Kurdî dram e

Pismam

Heke em bixwazin dîroka şanoya Kurdî ya li "başûrê Kurdistanê" bidin naşın, nabe ku raste rast em biçin ser dîroka şanoyê û behs ji wan orf û adetan nekin ku pêwendiyâ wan a bingehîn bi destpêka şanoyê re heye û tevî wan kevneşopan cureyek ji "dramê ye. Her wiha orf û adetên resen û ji nav jiyan û qewimînên gelê Kurd serî hil dane. Lewma em dixwazin di destpêka behsa wan orf û adetan de bi awayekî lez bikin.

1- Dîwanxane: Di nav Kurdan de cihê zilamén maqûl, serokêl, hes û jîrekan û şuna civin, hevditîn û dembuhartînê bûye. Dema ku gotin hatiye ser qiseyên xweş û çirokgotinê, zilamekî dînyadîtî û gotinxwêş bûye çirokbêj û kesên rûnîstî yên dîwanxaneyê bûne temâşevan û li gel wî jiyan e. Bînerên çirokbêj bi bilindbûna wî re bîlind, bi daketina dengê wî re daketine. Bi vî awayî gava ku em li mijarê dînhîrin, dibînin ku eger dramayeke pirr xwerû û sivik be jî havêneke şanoyî tê de ye. Aktorek dipeyive û çirok dibêje, cend kesên temâşevan jî lê guhdarî dikin.

2- Şahname: Cureyeke din i vê mijarê ye. Ev kar bi kesên zimanzer û şareza ve tê kirin, li wan tê spartin, di şevan de jî kabira bi xwe û şahnâmeyê ve li cihekî amade dibe û koma gel jî li di kat û şuna ku hatiye diyarkirin, li darê li hev kom dibin û ew jî dest bi xwendina şahnâmeyê, hin caran jî di şuna lehengê bûyerê de dest bi

listikê (cureyekî ji listikên sivik) dike.

3- Béguman hin "Sînî û Zerf" û "Kilawêñ" (kum) ku du listikên Kurdan ên zehf belavbûy ne li başûrê Kurdistanê, em jî wan dixin qalebê havêne şanoyê û di vî warî de gelek bir û rayêñ cuda hene.

4- Beyt û Balore: Yek e ji hovê diyar û eşkere ya şanoyê û di vî warî de gelek tiştîn ciwan û xweşik têne dîtin. Ji bo nimûne; diyardeya **"Bûka Baranê"** di beyt û baloreyê Kurdî de. Di nav civaka Kurdî de ev diyarde wisa ye: Eger salek baran bi derengî bibare zar û zêç û ciwan di nav xwe dê kom dibin û yekî ji wan ji xwe re dibijîrin, dikin "bûka baranê". Li mal, kuçe û kolanan digerin û pere, xêr û sedeqe dicivînin, bi wê kirina xwe re jî vê beytê dibêjin:

Bûkê bi baranê
Awîy bin dexlanê
Satiy caranê.
An jî:
Helaran û belaran
Ya xwa dakeyte baran
Bo feqîr û hejaran
Naniy feqîr zor key
Çawiy dijmin kwêr key.

Bi kurtî ev diyarde, beşekî zindî ne di seretay û destpêka şanoya Kurdî de û hemû toxmê zindî têne jimartin ji bo çêbûna tevgera şanoya Kurdî.

Ne ku ev bi tenê û di şanoya Kurdî de di seretay û destpêka şanoya cihanê de jî hene û şuna wan xuya ye. Her di vê demê de ku **kabirayê nêçîrvan ji nêçîrê vegeiyabemal û serpêhatiyê xwe ji bo jin, zarokêñ xwe goti-**

be, wê demê kabirayê nêçîrvan bi xwe bûye aktor û jin û zarok ji bûne bîner. Béguman ev hemû tişt, weki havêne şanoyê an gava destpêkî an ji seretaya bizavê tê hesipandin. Bir û baweriyê cihê cihê li ser vê yekê jî hene. Lî em di vê kurtenivîsê de nikarin li ser wan rawestin.

Şanoya Kurdî ji wek sercem (hemû) şanoya gelê Rojhilat Navîn şanoyeke "wergirî" ye. Di bîstê vê sedsalê de ew quatabiyêñ (xwedekarêñ) Kurd ên ku ji bo mebesta xwendinê çûbûn paytexta Iraqê Bexdayê, dikaribûn vê hunerê li wê bistînin, fêr bibin û paşê biguhezîne ji bo Kurdistanê. Di sala 1926 an de ji bo cara pêşin şanogeriya Kurdî li bajarê Silêmaniye hatiye pêşkêşkirin.

Navê vê jî **"Ilm û Cehil"** e û em bikaribin bibêjin nivîskar û rîveberê (derhêner) wê **Fuat Reşîd Bekir** e û yek ji damezrenêrên tevgeriya şanoya Kurdî ye. Lî **Mexcid Haci** dibêje: **"Lijneya fen û temsila dibistana yekemîn a Hewlîrê, di payîza 1921'an de şanogeriya Selahedînê Eyûbî ji bo çend rojan pêşkêş kiriye û piyesa şanoyê Necîb Hedad çekiriye û sîd ji şanoya Wild Scot wergirîye."**

Ev herdu berhem heta niha wek destpêka şanoya Kurdî tê jimartin û gava aşinabûna vê hunerê bi netewaya Kurdî û xala seretaya şanoya Kurdî ye li başûrê welêt.

Edî pişti wan ev huner bi giranî û wek hunerekî zindî ji a-

liyê gel ve lê hatiye mîzandin, roj bi roj perisiye û belav bûye, heta bajarê din noli Kerkük, Di-hok, Xaneqin û hwd. jî girtiye û li wan bajaran ji ev huner li ser destê xwendekar û ronakbîran gihişte dîdarra xelk û gelê Kurdistanê, bi vî şeweyî ji bo cara yekemîn di dîroka çandî ya xwe de bi vî hunerê mezin aşna bû.

Di dawiya bîstan de ku, dibistana zanistî li bajarê Silêmaniye bi destê **Pîremerd** ê nemir²⁹ û kesen ronakbîr çêbû, roleke mezin di pêşxistina sercem bizavê çandî yân Kurdî de bi gişî û şano bi taybeti jî aniye.

Pîremerd ê nemir her alîkar û hevkarê şanoger û huner-mendan bûye bi tenê, ew bi xwe jî wek nivîskarekî şanoyî (temsili) hatiye holê û di vî warî de cihê wî û şopa wî xuya ye. Şuna herdu piyesen wî **"Mem û Zîn"**³⁰ û **"Mehmûd A-xayê Siwekel"** di mejuya şanoya Kurdî berbiçav in.

Bîşik aşinabûn û çêbûna hunerê şanoya Kurdî di dîroka çanda Kurdî de çêbûneke lewaz û negîşîr bûye, wek ku di serî de me got, bi destê çend suxteyan ev huner guhaztine Kurdistanê ku ew jî, ji ş

anoya Erebî ya Iraqê hatiye standin û wan jî, ji yân din wergirtine.

Salân siyan jî gavê berde-wamiya wê destpêkê ne û bêyî ku şano hêdî hêdî gihiya bajarên biçûk û mezin tu pêşketîneke mijari di xwe de nedîtiye, di vî warî de xalên wergirandin û derbaskirinê bi lez bi çav na-keve, bêyî cend hewlêñ dilsoz ku li vir û wir belav dikevin.

Lî ev heye bi destê çend kesen dilsoz û lixweberdû, kari-bûne berde-wamiya vî hunerî bigirin û nehêlin ku ber bi mirinê biçê, ne her ev tişt belkî ew berde-wamiya ku bû sebebê çêbûna ew qonax ku şanoya Kurdî pê gihişî û karê pirr afirîner bi xwe re bîne. Béguman xalê seretay û gava mezin jî, ji bo wê demê digirt ku ew canfi-dayan ev huner domandin.

Ev qonaxa destpêka şanoya



Dîmenek ji şanoya bi navê Selahedînê Eyûbî Hewlîr 1939

Kurdî nemaze heta dawî salen çilan wek pêvajoya şanoyê ya dijwartîrîn tê jimartin, cunki domana çêbûn û aşinabûna hunerê bûye bi miletekî ku tu car ev cure huner nedîtiye û lê temâse nekiriye, di vê rewşê de fedekarî û cangoriya şanogerên vê qonaxê diyar dibe.

Wê bidome

Perawêjên vê beşê:

* Pirtûka "Afred le şanoyî Kurdî de" ya Mexcid Haci, sala 1989 hatiye çapkirin.

Di vê nivîse de bi tenê ji bo çavkanî ev pirtûk li ber destê min hebû, ji bilî wê ci di bîra min de hebûye min nivîsiye.

** Pîremerd ê nemir, şair, feylesof û rojnamenivîsê mezinê gelê me (1867-1950) ris-teke wî ya diyar û berbiçav di gesandin û tevgera ziman û çanda Kurdî de heye.

*** Dadgehîn Rizgariyê (İstiklal Mahkemeleri) di dema da-rizandina **Şêx Seidê Piranî** û hevalên wî de ev çirok sücdar kîrin ku sebebeke mezin bûye ji bo çêbûna serhîldanê, cara yekemîn ev çirok li Stenbolê di 1920'an de hatiye çapkirin. Di dema daleqandina Şêx Seid û hogîrên wî de hemû destnivîs û weşanên Mem û Zîn di Meyda-na Sarayê de şewitandine.

Li vir ji bo me diyar dibe ku gelê Kurd ne her av û axa wî zi-man, huner û canda wî jî tim ketiye ber talan û şewatê û her tim jî armancêñ dijmin ev bûne.

Wergerîna

ji Kurmanciya Jérîn:

Pismam û Zana Farqînî



Ji şanoya salên 1950'î li Silêmaniye

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedi (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyare Nivîsaran (Yazi İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel: 513 34 33 Tel (fax) 511 50 07
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 53117 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 (Navbera saat 11.00-16.00)
- Fax: (49) 228-630715
- Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ,

welat